

# Bi ruhê Sarayan li Parîsê ne

Bi pêşengiya TJK-E û sazî û dezgehên jinên kurdistanî yên li derveyî welat ji bo lanetkirina Komkujiya Parîsê û bibîranîna her sê jinên şoreşger ên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez îro li Parîsê meşeke mezin dê pêk were. Ji bo meşê amadekarî bi dawî bûne û ji gelek bajarên Ewropayê jî kurdistaniyan berê xwe daye Parîsê. Saziyan da zanîn ku dê rê nedin ku ser dozê were girtin...

Jinên Ciwan ên Azad, Komeleya Malbatên Şehîd û Windayan (KOMAW), Ciwanên Şoreşger bi çalakiyan bal kişand ser girîngiya xwedîderketina li mîrateya Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemezê. KOMAW'ê ji bo meşa 7'ê çileyê ya li Parîsê ev bangewazî kir: "Ji bo ku em hesab ji kujeran bipirsin, em bang li her kesî dikin ku bi ruhê serhildanê tev li meşa protestoyê bibin."... RÛPEL - 2

ROJEVA
Medya
7 Çile Şemî 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 58

# Îmrali rejîma înfazê ye

## DI SALEKÊ DE TENÊ HEVDÎTINEK PÊK HAT

Buroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî tecrîda li Îmralıyê li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin, rapora salê amade kir. Di raporê de derdikeve holê ku tecrîd bi OHAL û KHK'an êdî bi awayekî fermî di meriyetê de ye. Di nav salekê de bi tenê carekê hevdîtin pêk hatiye û Ocalan terkî bêdengiyê hatiye kirin...

## RAMANÊN OCALAN PÊŞÎ VEDIKIN

Di raporê de tê diyarkirin ku sazî û dezgehên navneteweyî yên wekî CPT'ê jî rol û rista xwe bi cih neaniye. Dîsa di raporê de girîngiya gotin û ramanên Rêberê Gelê Kurd ên di demên kaotîk de jî hatine bibîrxistin û tê destnîşankirin ku encax bi muxalefeteke mezin a civakî tecrîd bê rûxandin...R-8

**Li Parîsê ji bo Ocalan meşiyan**

Li Parîsê Jinên Ciwan ên Azad bi meşeke meşaleyî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir... R-7

**Eşîran azadiya Ocalan xwest**

Eşîrên mixurî û millî xwest ku kongreya neteweyî pêk bê û her wiha xwest ku bo bidawîbûna tecrîdê kurd tê bikoşin...R-7

Di encama Xezeba Firatê de Keleha Caberê jî hat rizgarkirin...R-5



## Peyrewên Sarayan in



Gerîlayên HPG û YJA Starê her sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez bi bîr anîn û wiha got: "Em ê bi doza Sarayan re dilsoz bin û heta dilopa dawî ya xwîna xwe têkoşîna xwe ya azadiyê bidomînin." Gerîlaya YJA Starê Avesta Gever bang li hemû jinan kir ku xwe bi rêxistin bikin û di nav refên têkoşînê de cihê xwe bigirin. Gerîlayan got ku ew ê bi bilindkirina têkoşînê xwedî li mîrayeta Sarayan derkevin... R2



## Bi kuştina kujer doz nayê girtin

Parlamentera HDP'ê ya Edeneyê Meral Daniş Beştaş pêvajoya hiqûqî ya 4 salan û mirina bi guman a Omer Guney nirxandin. Beştaş anî ziman ku li gel komkujî rasterast Tirkiyeyê eleqeder dike jî Tirkiyeyê reşkirin tercîh kir û wiha got: "Serokomar Erdogan dibêje 'ew dizanin kê komkujiya Parîsê pêk aniye'. Bi vê yekê Erdogan hewl dide komkujiyê bixe stûyê Cemaeta Gulen." ... R2

**Gerîla Alîşêr Pîr:**


**Mi fam kerd ke Sara abîdeya merdimî ya**

Gerîla Alîşêr Pîro ke qetilbîyayîşê 3 ciniyê yê Parîsî ra dima beşdarê gerîla bîbî, serrgêra Qetilkerdişê Parîsî de qisey kerd û wina va: "Sara (Sakîne Cansize), Leyla Şaylemeze û Fîdan Dogane kam bîy? Mi o wext cigêrayîş kerd û mi fam kerd ke; embaza Sara abîdeya merdimîye ya."... RÛPEL- 11

**Ev kaos mizgîniya azadiyê ye ...**
Nivîsa Îskan Şîvhelan RÛPEL - 7

**Verra nî herîşan têhet ameyene...**
Nivîsa Meral Kuçuk RÛPEL - 10

## 'Merdim ancax eşkeno xo rexne bikero'



Gerîla Numan Amedî wina va: "Sakîne şexsîyetêko winasî bîye ke merdim ancax eşkeno vera aye de xo rexne bikero"

Gerîla Numan Amedî va 'embaza Sakîne şexsîyetê ciniyêk de serkewtişî xelq kerde' û qiseykerdişê xo wina domna: "Mi serra 96 de warê Rayberî de embaza Sakîne şinasna. Tayê şexsîyetî estî, her tim herikîyenî. Tarîxê ciniyê dinya de şexsîyetê sey Rosa Luksemburge, Klara Zetkîne û sewbîna estî. Embaza Sakîne mîyanê PKKyî de temsîlkarîya şexsîyetê cinî kerdêne. Ciniyê sey Sara kêmî yî. Vera şexsîyetêko winasî de ancax merdim eşkeno xo rexne bikero." RÛPEL - 11





## Tabeleya kurdî bûye kelem

**Qeyûmên AKP'ê li dijî kurdî zikreşiya xwe didomînin. Qeyûmê Şaxê tabelaya pirzimanî rakir**

Qeymeqamê Erdîşê Mehmet Şîrîn Yaşar ku wek qeyûm tayînî Şaredariya Erdîşê hat kirin, xwe li tabeleya 'Rezên Aştiyê' ya bi kurdî, ermenkî û tirkî ranegirt. Qeyûm 'Rezên Aştiyê' şikand û li şûna wê tabelayê '1'ê Nîsanê' bi cih kir...R-6

## Ji bo navenda jinan zilam erkdar kirin

Qeyûmê ku hate şûna hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Bekîr Kaya Walîyê Wanê Ibrahîm Taşyapan jin kirin hedef. Qeyûm Taşyapan, karmendekî mêr anî ser Seroktiya Desteya Jinan....



RÛPEL - 6

**Qeyûm êzidî qewirandin**

Qeyûmê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê êzidiyên ku ev serê 3 salan e li Amedê li Fîdanlikê bi cih û war bûne, qewirandin... R.6



www.arsivakurdi.org

## Welatên Skandinavyayê îro dadikevin kolanan

**JI BO YEK JI** damezrînerên PKK'ê Sakîne Cansiz (Sara), Nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan (Rojbîn) û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez (Ronahî) ên di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê ji aliyê dewleta tirk ve hatin kuştin, dê kurd û dostên wan ên li welatên Skandînavyayê îro dakevin qadan û daxwaza edaletê bikin. Tevgera Jinên Kurd a li Skandînavyayê ji ber salvegera kuştina her sê şoreşgerên kurd daxuyaniyeke nivîskî weşand û bang li jin, kurdistanî û dostên wan ên li welatên Skandînavyayê kir û ji bo aşkerakirina komkujiyê, pêşîgirtina li komkujiyên nû û sekinandina operasyonên qirkirina siyasî ku dewleta tirk li dijî gelê kurd dimeşîne, dakevin qadan. STOCKHOLM - ANF





## Sê şoreşger pêşengên me ne



Endama Koordînasyona KJK'ê Jiyan Garzan di salvegera kuştina siyasetmedarên kurd Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar de ku roja 5'ê Çileya 2015'an li Silopiyê ji aliyê dewleta tirk ve hatibûn kuştin, axivî. Garzan sê jinên şoreşger bi bîr anîn û ragihand ku kuştina wan bi plan û bi proje hatiye kirin û wiha got: "Du cureyên mirinê hene; mirinek heye tu ji mirinê jiyaneke nû, civakeke nû ava dikî, azadiyê ava dikî. Mirineke din jî heye ku tu xizmetê ji desthilatdariyê re dikî, tu xizmetê ji kedxwariyê re dikî. Ev cure mirin mirinan zêde dike. Ji ber wê yêkê jî jiyana van hevalan bêmirin bû. Kesayetiya wan bêmirin bûn. Sêvê, Pakîze, Fatma pêşengên me ne."

Di dema şehîdbûna hevala Sara wan de jî di Rojhilata Navîn de Serok Apo bi sekna xwe, bi felsefeya xwe, bi nexşerêya xwe, ji bo çareserkirina pirgirêkên gelan ên nasname, çand, ol hêviyeke nû bi xwe re anî, nexşerêyeke nû nîşan da. Di heman demê de di berxwedana xwerêveberiya xweser de jî careke dî êrîş birin her sê jinan, ev jî ne bi tesadufî bû. Di heman demê de bi plan, proje û zanebûn ev êrîş birin ser wan." BEHDÎNAN - ANF

## Bi meşa meşaleyî komkujî lanet kirin



Endamên rêxistina Ciwanên Azad ji bo komkujiya Parîsê şermezar bikin û 3 jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şeylemez bi bîr bînin li ber avahiya Parlamentoya Bernê ya Swîsreyê meşa bi meşaleyî pêk anî. Di çalakiyê de ciwanan bê navber dirûşmên 'Jin Jiyan Azadî' û "Sara, Rojbîn û Ronahî' berzkirin. Meşa ciwanan heta stasyona trenê ya navendî ya Bernê dewam kir. Her wiha Saziya Malbatên Şehîd û Windayan (KOMAW), bi wesîleya komkujiya Parîsê daxuyaniyeke nivîskî weşand û komkujî lanet kir. KOMAW destnîşan kir ku rejîma Fransayê ji ber berjewendiyên xwe bi Tirkiyeyê re komkujiya Parîsê ronî nake. KOMAW bi vê armancê bang li her kesî kir ku îro beşdarî meşê bibin da ku hesab ji kujeran bipirsin. ANF

# Nûnerên jinên azad Sara, Leyla, Fîdan

Gerîlayên HPG û YJA Starê her sê jinên şoreşger Cansiz, Dogan û Şaylemez bi bîr anîn û wiha got: "Em ê bi doza Sarayan re dilsoz bin û heta dilopa dawî ya xwîna xwe têkoşîna xwe ya azadiyê bidomînin."

JIYAN ARÎNGÎ - ŞÎLAN ZAP / BEHDÎNAN – ANF



Gerîlaya YJA Starê Dîcle Rojhilat her sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan bi rêzdarî bi bîr anîn û diyar kir ku Komploya Parîsê komployeke navneteweyî ye ku ji aliyê hemû hêzên komploger ve hatiye plankirin. Rojhilat da xuyakirin ku ev komkujî yekser li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Tevgera Azadiya Jinê û gelê kurd hat kirin û got ku Sara ji bo wan nûnera xeta azadiya jinan e. Rojhilat ragihand ku bi dilsozî û hesasiyeta Rêberê wan ya ji bo xeta azadiya jinan dizanîn loma komkujiyek bi vî awayî namerdî kir. Rojhilat destnîşan kir ku ew ê bi eşqa azadiyê ya Sarayan tê bikoşin.

Gerîlayê HPG'ê Nizar Zêrîkeryan her sê jinên şoreşger bi rêzdarî bi bîr anîn û got ku divê neyê jibîrkirin ku dê hesabê vê komkujiyê û hemû komkujiyên din were pirsîn û wiha got: "Kujer kî dibe bila bibe, rola Parîsê ya di vê komkujiyê de mezin e. Fransa bi bêdengiya xwe û bi ronînekirina dozê re nîşan dide ku hevkarê qetlîamkeran e." Zîreker destnîşan kir ku ji bo wan Sakîne Cansiz ji ber ku nûnera jinên azadî bû, loma ew hedef hat nîşandan.

**ARMANC AZADÎ BÛ**

Arjîn Mêrdîn destnîşan kir ku komkujiya Parîsê komkujiyeke li dijî xeta azadiya jinan e û ev tişt anî ziman: "Rêberê me ji destpêka damezirandina tevgera azadiyê û vir ve ji bo jiyaneke bi hev re û azad a gelan tê koşiya. Her tim bû alîgirê aştiya navbera gelan. Ji bo mirovahiyê bi şev û roj xebitî û ji bo aramiya gelan tê koşiya. Bi taybetî ji bo Tevgera Azadiya Jinan tê koşiya. Di vê rêyê de yek ji hevrêyên wî yên herî giring jî hevala Sara ye, ku nîşaneya azadiya jinan e."

Mêrdîn da zanîn ku divê were zanîn têkoşîna ji bo ronîkirina komkujiyê û têkoşîna li hemberî dîktatoriya Erdogan dê heta serkeftinê bê navber bidome.

## Dixwazin dozê reş bikin

Tevî ku di ser qetilkirina sê siyasetmedarên kurd Sakîne Cansiz (Sara), Fîdan Dogan û Leyla Şaylemezê re 4 sal derbas bûne jî hiqûq nehatiye cih û herî dawî jî yekane gumanbarê dozê Omer Guney li girtîgehê mirî hat dîtin. Tê gotin ku Omer Guney ji ber pirsgirêkên tenduristiyê miriye, lê balkêş e ku demek kurt ji doza ku di 23'ê Çile yê re mabû mir.

Parlamentera HDP'ê ya Edeneyê Meral Daniş Beştaş pêvajoya hiqûqî ya 4 salan û mirina bi guman a Omer Guney nirxand. Beştaş anî ziman ku 9'ê Çileya 2013'an ji bo kurd, tirk û çareseriya pirs-



girêka kurd gelek girîng e û wiha got: "Sê siyasetmedarên kurd li navîna Parîsê li cihekî ku kamera û tedbîrên ewlehiyê hebûn ji aliyê welatiyê Tirkiyeyê Omer Guney ve hat qetilkirin. Hemû cîhanê ev temaşe kir û nirxand. Beriya vê bûyerê di 3'ê çileyê de heyeta Îmraliyê bi birêz Ocalan re hevdîtin kir. Piştî vê hevdîtinê bûyer pêk hat." Beştaş anî ziman ku komkujiyek raste rast Tirkiyeyê eleqeder dike û lê Tirkiyeyê ne zelal bûn, reşkirin tercîh kir. Tirkiyeyê hewl da ku komkujiyê di nava demê de belav bike û bide jibîrkirin. Beştaş destnîşan kir ku belgeyên aydê MÎT'ê di çapemeniya civakî de derketin û herî dawî wiha got: "Serokomar dibêje 'ew dizanin kê komkujiya Parîsê pêk aniye'. Hewl didin komkujiyê bikin ser Cemaeta Gulen. " Meral Daniş Beştaş diyar kir ku mirina Omer Guney beriya dîtina dozê bi gûmane û got ku ew ê bibin şopdarên dozê û dê nehêlin ku doz were girtin.

*AMED - ŞÛJIN*

## Dê tola jinên şoreşger were hilanîn

**GERÎLAYA YJA STARÊ** Avesta Gever anî ziman ku ne pêkan e ku ev komkujiya Parîsê ya li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tevger azadiya jinan hatiye kirin bê jibîrkirin û destnîşan kir ku meşa li ser şopa nûnerên xeta azadiya jinan a Sara, Leyla û Fîdan, ji bo wan wezîfeyeke pîroz e.

Gever diyar kir ku di vê dema ku komkujiya jinan gelekî zêde bûye, berpirsyariya wan e ku bi rengekî bê navber tê bikoşin û wiha got: "Çawa ku li Parîsê Sara yên ji bo azadiyê têdikoşin hatin kuştin, li Silopiyayê jî Sêvê, Fatma û li Cizîrê Dayika Taybet kuştin. Jinên azadîxwaz her tim dibin hedef. Ji ber ku jin çavkaniya jiyanê ye." Gever bang li hemû jinan kir ku xwe bi rêxistin bikin û di nava refên têkoşînê de cih bigirin.

Azad Tatvan jî got ku Sara, Leyla, Fîdan hêviyên azadiya jinan bûn loma hedef hatin nîşandan û da zanîn ku ew dê tola wan hilînin.

**XETA AZADIYÊ**

Bêrîvan Harûn diyar kir ku li dijî zîhniyeta despotîk û serdest a mêran, pêwîstiya jinan her tim bi xweparastinê heye ku xwe bi çek, bi siyaset û bi birêxistinbûnê têkoşîn bê meşandin. Harûn destnîşan kir ku ew dê di xeta azadiya jinan a Sarayan de bimeşin. Gerîlayên YJA Starê Ciwana, Rûken Rojhilat û Cihanê Mêrdîn jî destnîşan kirin ku Sakîne Cansiz damezrînera şoreşa azadiya jinan e û ew ê şopdarên wê bin.

## Komkujî dê bê bersiv nemîne



Rêxistina Jinên Ciwan ên Azad têkildarî komkujiya Parîsê ku sê jinên şoreşger Sara, Rojbîn û Ronahî hatin qetilkirin de daxuyaniyek weşand û her sê jinên kurd bi bîr anîn û kujer lanet kirin. Koordînasyona Jinên Ciwan destnîşan kir ku 9'ê Çileya 2013'an dê tu carî ji hişê jinên kurd dernekeve û ev tişt hat gotin: "Bi kuştina her sê jinên azad dijmin dixwest xeta jinan ya berxwedêr û serhildêr tune bike. Îro em dizanin ku ew xet hîn bilintir bûye û ew ê xwe bigihîne asta herî jor. Dibe ku ew her sê şoreşger bi fîzîkî dinava me de nebin lê belê ew bi fikir û ramanên xwe bi mere ne. Ew ruh bingeha xwe ji Besêyan, Zîlanan, Bêrîtanan û Viyanan digirin. Koordînasyonê bang li jinên ciwan kir ku bi ruhê Sarayan, Rojbînan û Ronahiyan tev li meşa îro ya li Parîsê bibin. BRÛKSEL - ANF

www.arsivakurd.org

## ‘Êdî gotineke em bibêjin nemaye’

Baroya Amedê di hefteya 58'emîn a qetilkirina serokê wan Tahîr Elçî de ji bo kujer bên dîtin, bi awayekî bibandor lêkolîn bê kirin û dosya bileztir bibe li ber dadgehê çalakî pêk anî. Gelek parêzer tev li çalakiyê bûn û pankarta ku wêneyê Elçî û nivîsa bi kurdî û tirkî ya “Em te ji bîr nakin” hat vekirin. Serokê Baroya Amedê Ahmet Ozmen di çalakiyê de axivî û wiha got: “Êdî gotineke em bibêjin nemaye. Ji bo cînayeta serokê baroya me Tahîr Elçî bê ronîkirin em li bendê ne ku tişta dikeve ser milê rayedaran pêk bînin. Em bang li Wezîrê Dadê, Wezîrê Karên Hundir û rayerdarên din dikin ku soza daye bi cih bînin.” *AMED*



## 405 sal ceza hat xwestin

Li Mêrsînê, di tebaxa 2016'an di çarçoveya operasyonên li dijî endamên Partiya Şoreşger de, 15 kes hatibûn girtin. Di îdianameya ji aliyê Serdozgerê Komarê Unsal Demîrcî ve hat amadekirin de, ji aliyê 7'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Mêrsînê ve hat qebûlkirin. Di îdianameya der barê 15 endamên Partiya Şoreşgeran de hat amadekirin de, ji bersûcan re bi giştî 405 sal cezayê girtîgehê hat xwestin. Di îdianameyê de li gel parvekirinên civaka medyayî, rojnameyên ji girtîgehê re hatin şandin jî wek sûc hatin hesibandin û her wiha dozger di îdianameyê de, 15 kes bi endamtiya TKKKO ya xwe fesij kir, tewanbar kirin. Dê darizandina endamên Partiya Şoreşger di rojên pêş de pêk bê. *MÊRSÎN*




## Nexweşxane tune ye!

Li navçeya Serayê ya Wanê ku gelheya wê 24 hezar e, ne nexweşxaneya dewletê ne jî ya taybet heye. Li navçeya ku 80 kîlometre dûrî bajêr e, welatiyên nexweş dikevin bi wesayîtê zêdeyî saetekê şûnde xwe digihînin nexweşxaneyê. Li navçeya ji 23 taxan pêk tê, tenê Navenda Tenduristiyê ya Malbatê heye û welatiyên serî li vê didin jî piranî sewqî navenda Wanê tên kirin. Ji niştecihên Taxa Kûrûcanê Gulçîçek Boydan anî ziman ku di warê tedawiyê de gelek kêmaniyên Navenda Tenduristiyê hene û wiha got: “Ez ducanî bûm. Li gel rewşa min nebaş bû jî ambulans neşandin, em bi derfetên xwe çûn Nexweşxaneya Dewletê ya Qelqeliyê.” *WAN*



# Porê girtiyan hat kurkirin!

**Girtiyên jin ên ku li Girtîgeha Tîpa C a Jinan a Tarsûsê dimînin, rastî pêkutiyên dijwar tên. Bi darê zorê porê girtiyên jin hatiye kurkirin û li jinan îşkence tê kirin. Piştî îşkenceyê jinan nabin nexweşxaneyê jî**



Hat diyarkirin ku kesên di çarçoveya operasyonên li dijî HDP'ê de hatin girtin û li Girtîgeha Tarsûsa Mêrsînê tên ragirtin, hatine derbkirin û bi darê zorê porê wan hatiye kurkirin.

Parêzer Sebahat Gençtarîh Cebe ya ji bo hevdîtina bi muwekîlên xwe re çû girtîgehê anî ziman ku muwekîlên wê bi wan re hevdîtin pêk aniye, porê hemûyan hatibû jêkirin û wiha axivî: "Dema me pirsî, em hîn bûn ku bi zorê porê hemûyan li 3 nimroyan xistine. Dema me ji rêveberiya girtîgehê jî pirsî, ragihand ku ev pêkanîneke girtîgehê ye. Her wiha em hîn bûn ku girtiyên roja ewil bi hev re birine ji ber ku bi nîzamiya leşkerî hejmar nedaye, bi awayî fecî rastî lêdanê hatine, hatine derbkirin, lê belê ew sewqî nexweşxaneyê nekirine."

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Mêrsînê jî têkildarî binpêkirinên mafan ên li Girtîgeha Tîpa C a Jinan a Tarsûsê raporek amade kir. Di rapora hat amadekirin de, ji bo pêdiviya germkirinê ya girtiyan, serê her girtiyekî êzingek tê dayîn. Di raporê de wiha hat gotin: "Li Girtîgeha Tarsusa Mêrsînê ya ku jin lê tên ragirtin, li odeyên 40 kesî 85 kes tên ragirtin. Ji ber ava şebekeyê ya li odeyên girtîgehê nayê vexwarin, rojê du caran bi satilan av tê kişandin. Heke av têr neke, careke din nayê û girtî bê av tên hiştin. Ji aliyê îdareya girtîgehê ve, ji bo pêdiviyên zarûrî yên girtiyan ên wek serşûştinê, ava germ û xwegermkirinê serê kesekî tenê êzingek tê dayîn."

**WEK DIJMIN DIBÎNIN**

Dîsa di raporê de hat diyarkirin ku, pêdiviyên tenduristiyê yên girtiyan bi cih nayên û wiha hat gotin: "Ji ber ku li girtîgehan wergêrê kurdî tune ye, nameyên girtî bi kurdî dinivîsin nayên şandin û her wiha nameyên tên jî nayên dayîn. Girtî rastî gelek pirsgirêkên tenduristiyê tên. Bi piranî daxwaz çûyîna nexweşxaneyê û revîrê bi sedemên cuda tên redkirin an jî heta demeke dirêj tên rawestandin. Ji aliyê îdareya girtîgehê ve, mîna pêdiviyên taybet ên girtiyan ên jî derve tên astengkirin û kirîna ji kantîna girtîgehê tê ferzkirin."
*MÊRSÎN - DÎHABER*

## Kampa êzidiyan hat valakirin


Kampa Fîdanlikê ya Şaredariya Yenîşehîrê ya Amedê ku piştî êrîşên DAIŞ'ê ya di 2014'an de êzidiyên ku koçber bûn û hatin Amedê lê diman, bi temamî hat valakirin. Kampa Fîdanlikê ya ku bajarekî ji konan hat avakirin 3 sal in ji bo mêvanên ji Şengalê hatine, malovaniyê dikir. Piştî vegera welatiyên êzidî hezar û 250 kes lê diman.



Welatiyên êzidî ji hêla qeyûmê di meha kanûnê de tayînî Şaredariya Yenîşehîrê hat kirin ve nehatin xwestin û ji wir hatin derxistin. Welatiyên êzidî birin kampa AFAD'ê ya Midyada Mêrdînê. Konên li kampê jî ji aliyê peywirdaran ve tên rakirin.

Êzidiyan li kampê dest bi jiyaneke binîzam kir û li vir bostan û sera hatibûn çêkirin. Welatiyên êzidî ji ber şertên zivistanê nedikarî ji kampê veqetin, ji wan re hatibû gotin ku dê ceryan û ava wan bên birîn. Ji ber vê yekê jî malbat mecbûr mabûn ji vir derkevin.
*AMED - DÎHABER*

## Li Girtîgeha Xarpêtê îdiaya îşkenceyê



**LI SER 6 GIRTIYÊN** di 2'yê çileyê de ji Girtîgeha Tîpa E ya Sêrtê sewqî Girtîgeha Tîpa T a Xarpêtê hatin kirin, pêkanînên 12'ê Îlonê tên ferzkirin. Girtiyê siyasî Refîk Kaçar ê zêdeyî salekî ye girtî ye, bi rêya malbata xwe pêkutiyên ku rastî wan hatine ragihand. Kaçar da zanîn ku dema ew hatine Xarpêtê rêveberiya girtîgehê li ser wan hêza xwe nîşan dide û destnîşan kir ku pêkanînên ku ne kêmî yên 12'ê Îlonê ne li wan tên ferzkirin.

Kaçar destnîşan kir ku ewlehiya wan a jiyanî tune ye û wiha got: "Ev pêkanînên rûmeta mirov binpê dikin, bi tu awayî nayên qebûlkirin. Gardiyan li korîdorên girtîgehê, bi awayekî fîzîkî û devkî tacîzê dikin. Girtîgeh veguheriye îşkencexaneyê. Sibe belkî dereng be, dengê me ragihînin."
XARPÊT - DÎHABER

## Leşkeran ciwanek birîndar kir

Ciwanê bi navê Fettah Guzel (26) ê ku ji navçeya Bazîda Agiriyê diçû Wanê, hat binçavkirin û li Qereqola Çatenliyê bi çekan hat birîndarkirin. Guzel ku ji kemaxa xwe birîndar bû, rakirin nexweşxaneyê. Li gorî agahiyên hatine bidestxistin dema Guzel bi wesayîta xwe diçû Wanê, li ser rêya Çaldiranê ji aliyê leşkeran ve bi hinceta “di wesayîtê de cigareyên qaçax hene” hat rawestandin. Guzel ku di wesayîta wî de lêgerîn hat pêkanîn, birin Qereqola Çetenliyê. Leşkerên ku di wesayîtê de tiştek nedît, Guzel derb kirin. Guzel ji bo ku ji îşkenceyê bireve, ji qereqolê reviya. Li ser vê yekê leşkeran gule lê reşandine û Guzel ji kemaxa xwe birîndar bûye. Guzel ku rakirine Nexweşxaneya Dewletê ya Bazîdê, tê dermankirin û nexweşxane ji aliyê leşkeran ve hatiye dorpêçkirin.
*AGIRÎ - DÎHABER*




## ‘Axa ku lê hatime dinê bibe kavil jî xeyala min e’

Li Şirnexê di 14’ê adara 2016’an de qedexeya derketina derve hat îlankirin û 246 rojan talankirin û hovîtiyê berdewam kir û bi hezaran kes ji ser axa xwe hatin koçkirin. Hinekan hewl da jiyaneke nû ava bikin û hinek jî bi rakirina qedexeyê re vegeriyan ser axa xwe. Esmer Kaplan a 21 salî ku yek ji sedan jinên hewl dide vegera mala xwe, piştî qedexeyê bi malbata xwe re neçar ma berê xwe bide Wanê. Kaplan zor û zehmetiyên ku dîtine, vegotin.

Kaplan hesreta xwe ya ji bo axa xwe ku lê hatiye dinê vegot û anî ziman ku ji ber qedexeyê tu tiştekî xwe negirtine û wiha got: “Em bi alikariya cîranên xwe li avahiyan bi cih bûn. Ji bo ku em xwarinê çêkin tu firaqek tune bû. Ji ber şert û mercên zivistanê sotemenî tune bû ku em bişewitînin. Cîranan dan me. Ji ber zehmetiyan ez nikarim bixwînim jî.”

Kaplan anî ziman ku ji bo mala ku lê hatiye dinê bibîne çûye Şirnexê û wiha bi lêv kir: “Li derdorê avahî tune bûn. Ez gelekî hestiyar bûm. Bîranîn, xeyal, zarokatî û tu tiştek li cihê xwe tune bû. Min tu carî êrîş û hêrs ev qas kûr nedîtibû. Zarokatiya min di bin kavilan de ma. Her çi qas bajar hatibe şewitandin jî ez dixwazin vegerim û li wir bijîm.” *WAN - DÎHABER*



www.arsivakurdi.org

## Li Kongoyê qebîle bi hev ketin

**LI GUNDEKÎ** bakurê rojhilatê Komara Kongo ya Demokratîk di navbera qebîleyên bi navê tanganyika û bantouyê de şer û pevçûn derketin. Di encama şer û pevçûnên qebîleyan de 15 kesan jiyana xwe ji dest da û 37 kes jî birîndar bûn. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin qebîleya tanganyîka êrîş biriye ser qebîleya bantouyê û 15 kes ji qebîleyê kuştine û agir berdaye avahiyên qebîleyê. Di encama êrîşa qebîleya tanganyîka de 65 avahiyên qebîleya bantouyê hatin şewitandin. Li Kongoyê beriya çend rojan di navbera qebîleyeke xwecih û polîsan de jî şer û pevçûn derketibûn û di encama şer û pevçûnan de 43 kesan jiyana xwe ji dest dabû. Li bejahiya Komara Kongoyê dem bi dem di navbera komên cuda de şer û pevçûn derdikevin û gelek kes ji ber van şer û pevçûnan jiyana xwe ji dest didin. **BRAZZAVILLE**



# Li Tirkiyeyê dê alozî zêde bibin



**Koma Qeyranên Navdewletî der barê şer û pevçûnên li cihanê de raporek amade kir û ragihand ku di 2017'an de li Tirkiyeyê ji ber şerê bi PKK'ê re dê alozî zêde bibin**


Koma Qeyranên Navdewletî der barê herêmên ku dê di 2017'an de şer û pevçûn lê zêde bibin de raporek amade kir. Li gorî rapora ku orjînala wê di Foreign Policyê de hatiye weşandin li Iraq, Sûriye, Tirkiye, Yemen, Berava Mezin û Gola Chadê, Komara Kongo ya Demokratîk, Başûrê Sûdanê, Afganistan, Myanmar, Ûkrayna û Meksîkayê di 2017'an de şer û pevçûn dê gelekî zêde bibin. Di raporê de Sûriye, Iraq û Tirkiye wekî herêmên sereke yên şer û pevçûnan hatine destnîşankirin.

Rapor bal dikişîne ser geşedanên dawî yên li Tirkiyeyê diqewimin û destnîşan dike ku ji ber şerê bi PKK'ê re aloziyên li Tirkiyeyê zêdetir bibin. Her wiha di raporê de tê gotin ku şerê PKK û Tirkiyeyê ketiya qonaxa herî bixwîn û di nav salekê de zêdetirî 2 hezar û 500 leşker, polîs û gerîlayan jiyana xwe ji dest daye. Li aliyê din di raporê de hovitiya dewleta tirk a li dijî gel û bajarên Kurdistanê jî hatiye nivîsandin û hatiye destnîşankirin ku di encama êrîş û operasyonên dewleta tirk de li Kurdistanê gelekî bajar hatine wêrankirin û 350 hezar mirov ji cih û warên xwe hatine koçberkirin.

Di raporê de beşeke fireh ji bo têkoşîna kurdan a li dijî DAIŞ'ê jî hatiye veqetandin û tê gotin ku destkeftiyên kurdan ên li Iraq û Sûriyeyê fikarên Tirkiyeyê zêde dikin. Her wiha di raporê de tê gotin ku divê serokê ayende yê Amerîkayê Donald Trump di navbera kurdan û Tirkiyeyê de navbeynkariyê bike û rageşiya di navbera kurdan û Tirkiyeyê de kêm bike. ***AMED***

## Amerîka wesayîtên zirxî dişîne

Amerîka bi armanca xurtkirina NATO'yê hejmareke maşîneyên zirxî dişîne Polonyayê. Berdevkê Wezareta Parastinê ya Amerîkayê Peter Cook der barê şandina maşîneyên zirxî de axivî û ragihand ku di hefteya pêş de bi armanca bihêzbûna NATO'yê hejmareke maşîneyên zirxî bişînin Almanyayê û ji wîr jî bişînin Polonyayê. Berdevk Cook diyar kir ku maşîneyên zirxî di çarçoveya bernameya piştgiriya welatên Ewropa yên Rojhilat ku tev li Însiyatîfa Ewlehiyê ya Ewropayê (ERI) bibin dê sewqî Polonyayê bên kirin.




Însiyatîfa Ewlehiyê ya Ewropayê (ERI) di 2014'an de hat destpêkirin û bi angaşta ku Rûsya êrîşî endamên tifaqê yên Ewropaya Rojhilat dike, di 2016'an de hat berfirehkirin. Wezareta Parastinê ya Amerîkayê ji bo bûdçeya ERI'yê ya 2017'an milyarek û 700 milyon dolar dirav veqetandin.

Her wiha NATO plan dike ku heta gulanê 4 hezar leşkeran li welatên Baltikê bi cih bike. ***WASHINGTON***

## Trump sefîrên Obama diguherîne

Li gorî rojnameya New York Times serokê ayende yê Amerîkayê Donald Trûmp ê piştî ku di 20'ê çileyê de dest bi serokatiya Amerîkayê bike, hemû sefîrên Amerîkayê yên ku ji aliyê Barack Obama ve hatine tayînkirin ji peywirê bigire û li şûna wan sefîrên nû peywirdar bike. Heke Trump guhertineke bi vî rengî bike dê li Amerîkayê qeyrana sefîran derkeve û li gelek welatan Amerîka bê sefîr bimîne.

Li aliyê din ji ber ku peywirdarkirina sefîran li Amerîkayê ji aliyê Senatoyê ve tê pêjirandin dibe ku peywirdarkirina sefîran demeke dirêj bigire.



Hat diyarkirin ku di demên pêş de di hemû saziyan de guhertinên bi vî rengî pêk werin û kadroyên Trump di saziyan de bên bicihkirin.

Her wiha hat ragihandin ku di dîroka Amerîkayê de guhertineke bi vî rengî heta niha pêk nehatiye û her tim li gorî plan û pêwîstiyan guhertina sefîran pêk hatiye. ***AMED***

## Mistura tev li hevdîtinên Astanayê dibe

Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyeyê Staffan de Mistura bersiv da vexwendina xwe ya hevdîtinên Astanayê û diyar kir ku dê helw bide tev li hevdîtinan bibe.

Mistura da zanîn ku serkeftina hevdîtinên Astanayê girêdayî yekgirtina hewlên agirbestê ye û giraniya Rûsyayê ya li ser Esad û têkiliya Tirkiyeyê ya bi rêxistinên cîhadîst re bi van gotinan anî ziman: "Bendewariya me ew e ku Rûsya li ser hikumeta Sûriyeyê û Tirkiye jî li ser komên çekdar ên muxalîf giraniya xwe deynin û rêya çareseriyê vekin." Mistura diyar kir ku ew hêvî dikin biryarên li Astanayê bên girtin, li Cenevreyê jî bên bikaranîn.



Li aliyê din Rûsya di çarçoveya agirbesta Sûriyeyê de dest bi kêmbûna hêzên xwe kir. Serfermandarê giştî yê Rûsyayê Valery Gerasimov der barê kêmbûna hêzên Rûsyayê yên li Sûriyeyê de daxuyaniyek da û ragihand ku bi fermana serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn dest bi kêmkirin û vekişandina hêzên xwe yên li Sûriyeyê kiriye. Hat ragihandin ku dê Rûsya keştiya balafirên şer a Kuznetsovê dê ji Behra Spî vekişîne. ***NEW YORK***

## Agir bi wargeha penaberan ket

Li bajaroka Hovelhof Staumuhleyê ya bajarê Paderbornê ya Almanyayê li wargeheke penaberan şewat derket. Di encama şewatê de herî kêm 60 kes birîndar bûn. Rayedarên Almanyayê yên ku der barê şewatê de lêpirsîn dan destpêkirin, da zanîn ku angaştên dijminên biyaniyan agir berdaye wargehê, ne rast in. Hat ragihandin ku li wargehê bi qasî 500 penaber dijîn. **PADERBORN**

## Çîn giraniyê dide enerjiya xwenûker

Komara Gel a Çînê amadekariyan dike ku giraniya xwe bide ser enerjiya xwenûker. Li gorî daneyên Daîreya Enerjiyê ya Neteweyî (NEA) dê heta 2020'an bi 146 mîlyar dolar razemenî li enerjiya rojê bê kirin. Di vê çarçoveyê de tê plankirin ku zêdeyî hezar santralên enerjiya rojê bên çêkirin û 5 qat bê zêdekirin. Her wiha dê Çîn giraniyê bide çavkaniyên enerjiyê yên ba û avê jî. **PEKÎN**

## Li Fasê dibistanên Gulen tên girtin


Fas jî li Fethullah Gulen teng dibe. Piştî ku gelek welatan dibistanên cemaeta Gulen ên ku wekî çerxa pişaftinê dihatin bikaranîn, hatin girtin, li Fasê jî dibistanên cemaetê tên girtin. Wezareta Karên Hundir a Fasê der barê girtina dibistanan de daxuyaniyek da û diyar kir ku hemû dibistanên cemaeta Gulen ên li Fasê biryara girtina wan hatiye dayîn. Dê di nav mehekê de dibistan bên girtin. **RABAT**

## Amerîkayê guh nedaye xurtbûna çeteyên DAIŞ'ê

Van rojên ku bi garantoriya Rûsya û Tirkiyeyê li Sûriyeyê agirbest hat îlankirin û li bendê ye ku li Astanayê di navbera rejîma Baasê û muxalîfan de hevdîtin bên destpêkirin, der barê Amerîkayê de angaştên sosret tên weşandin.

Hat angaştkirin ku Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê John Kerry di hevdîtineke xwe de ya bi muxalîfên Sûriyeyê re gotiye ku wan bi armanca ku serokdewletê Sûriyeyê Beşar Esad bînin ser maseya muzakereyan, ji dûr ve li bihêzbûna DAIŞ'ê temaşe kiriye.

Her wiha tê angaştkirin ku Kerry diyar kiriye ku ew ji ber piştgiriya serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtin a ji bo Beşar Esad di vê polîtîkaya xwe de bi ser neketine. ***AMED***



www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
7 Çile 2017 Şemî

# Deriyê Firatê hat vekirin



Keleha dîrokî a Caberê ya ku demeke dirêj e di dorpêça şervanên HSD'ê de bû, hat rizgarkirin.

**Şervanên Xezeba Firatê di encama pevçûnên dijwar de keleha dîrokî ya Caberê ku xwedî cihekî stratejîk e, rizgar kir. Di encama pevçûnên li herêmê de 29 çete hatin kuştin û gelek çek hatin bidestxistin**

Gundên Caber ên Rojhilat û Caber Rojava ku di 25-26'ê kanûnê de hatibûn rizgarkirin, ev çend roj e rastî êrîşên dijwar ên çeteyên DAIŞ'ê dihatin. Bi şikandina êrîşan, şervanan berê xwe da Keleha Caberê û di encama pevçûnan de keleh rizgar kir.

Li gorî agahiyan, di encama pevçûnên li keleha Caberê de 29 çete hat kuştin û şervanan dest danî ser 2 BKC û 2 çenteyên wê, roketavêjeke RPG'ê û 4 roketên wê, 2 keleş, 3 bombeyên destan, wesayîtek, treksek û 3 cenazeyên çeteyan. Li gorî agahiyên ji fermandarên Odeya Çalakiyan a Xezaba Firatê hatine wergirtin, du baskên ku 31'ê kanûnê de ji Eyn Îsayê tevli hemleyê bibûn, gundên Nasiriye, Um Hecera, Bir Erdarî, Tellac û 4 gundên din û 5 gundikên navê wan nehatin zanîn, rizgar kirin. Her wiha hat zanîn ku li gundê Siwediyê jî di navbera şervanan û çeteyan de pevçûnên dijwar diqewimin. *REQQA - ANHA*

## Ciwan ref bi ref tev li HSD'ê dibin

**YEK JI** fermandarên HSD'ê Ebdo Reqawî da zanîn ku hemleya Xezeba Firatê bi serkeftî dewam dike û diyar kir ku ji bo parastina sivîlan hemle dereng diçe.

Fermandar Ebdo Reqawî destnîşan kir ku pêngava Xezeba Firatê bi serkeftî didome û ev tişt anîn ziman: "Hêzên me wekî ku hatiye plankirin roj bi roj ber bi navenda Reqqayê ve diçin. Çeteyên DAIŞ'ê sivîlan wek mertalên zindî bi kar tînin. Ji bo vê yekê jî em bi baldarî tev digerin û sivîlan li cihên ewle bicih dikin."

Di dawiyê de jî Reqawî wiha got: "Bi rizgarkirina herêmê, ciwanên herêmê bi baweriyeke mezin tev li hêzên me dibin. Bi taybet jî ciwanên gundên Reqqayê tev lê dibin. Em soza rizgarkirina tevahiya Reqqayê ku me dabû gelê xwe, dubare dikin." **REQQA - ANHA**

## Ciwanan bi zorê tev li şer dikin

Koma Birayên Misilman bi hevkariya îstixbaratên Tirkiye û Qeterê ji bo avakirina hêzeke nû li herêmê, ciwanên Sûriyeyê bi darê zorê beşdarî nava çeteyên dewleta tirk dikin.

Artêşa tirk a dagirker ku li herêma Babê derbeyên giran dixwe, bi armanca mîsogerkirina dagirkeriya xwe ya li herêmê li gel îstîxbaratên Qeter û Birayên Misilman li Tirkiyeyê dest bi planeke nû kirin. Di çarçoveya plana nû de hêzên îstîxbaratê ji hemû kampên penaberan agahiyên ciwanan berhev dikin û bi darê zorê tevli şerê li herêma Şehbayê dikin.



Çavkaniyên ji van kampan dan zanîn ku heta niha hêzên îstîxbaratê li kampa Islahiyê 1-2 yên Kîlîsê derdora 500 penaberan perwerde kirine û dişîne herêma Babê. Çavkaniyan anîn ziman ku ev kes li herêmên nêzî sînor piştî perwerdeya 15 rojan dişînin herêma Şehbayê. *EFRÎN - ANHA*

## Pêşeroja gelên Sûriyeyê

Endamê Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Ferhad Dêrîk anî ziman ku bi federaliya demokratîk hemû gel digihîjin mafên xwe.

Ferhat Dêrik diyar kir ku reşnivîsa hevpeymana civakî di encama xebatên girîng de hat amadekirin û wiha domand: "Di civîna duyemîn a meclisê de jî hat erêkirin. Di heman demê de biryara komîteya amadekirina zagona hilbijartinan, komîteya dabeşkirina rêveberiyê û çêkirina nexşeya herêmê diyar bû."

Dêrik axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em dikarin bibêjin ku gelên li bakurê Sûriyeyê pêşeroja xwe di federaliyê de dît. Hemû kes dizane ku tekane rêya çareseriyê federaliya demokratîke. Bi federaliyê, hemû gel mafên xwe bi dest dixin." *KOBANÊ - ANHA*

## 'Êdî sebra me li dijî êrîşan nemaye'

Hevserokê meclisa damezirîner Mensûr El Selûm diyar kir ku ew li hemberî destwerdanên dewleta mêtinger a tirk bêdeng namînin.

Hevserokê Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Mensûr El Selûm da zanîn ku bi pêşveçûnên şervanan li herêmê, dewleta tirk a dagirker jî êrîşên xwe yên li dijî herêmê zêde kirin û wiha dom kir: "Rojane li ser sînor sivîlan qetil dike. Tirkiyeyê qanûnên navneteweyî binpê kir û dest bi dagirkirina axa bakurê Sûriyeyê kir."

Mensûr El Selûm dewleta tirk weke dewleteke metînger pênase kir û ev nirxandin kir: "Tirkiyeyê ji Cerablus heta Babê herêm dagir kir. Ev ax bi xwîna zarokên me hat rizgarkirin. Hemû deverên ku me rizgarkirin, gelên wê herêmê xwe bi xwe birêve dibin. Em ê li hemberî vê dagirkeriyê bêdeng nemînin. Êdî li dijî van êrîşan, sebir û hedara me namaye." *DÊRIK - ANHA*

## Ji bo zimanê çerkezî amadekariyan dikin

Welatiyên çerkez ên li Minbicê destnîşan kir ku ew jî dixwazin bi zimanê dayikê perwerdeyê bibînin û da zanîn ku Komîteya Perwerdeyê ya Minbicê ji bo vê daxwaza wan amadekariyên girîng dike.

Der barê mijarê de welatiyên çerkez ên bi navên Ramî Bilox û Lena Qibratî da zanîn ku ji bo parastina zimanê xwe wan serî li komîteya perwerdeyê daye û ev tişt anî ziman: "Em hêvî dikin ku zarokên çerkez jî bi zimanê xwe biaxivin û bi vê yekê zimanê xwe ji windabûnê rizgar bikin."



Endama Komîteya Perwerdeyê ya Minbicê Xezal Şêx Mihemed jî da zanîn ku mafê her pêkhateyekê ye ku bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne û wiha got: "Ji bo daxwazên çerkezan, pêdiviya me bi mamosteyan heye." *MINBIC - ANHA*

## Geşedanên dawîn hatin nirxandin

Bi armanca nirxandina geşedanên dawî yên li herêmê, Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) civînek bi welatiyên bajarok û bejahiya Til Hemîsê re li dar xist. Di civînê de tevî endamen TEV- DEM'ê, bi dehan rûsipî, hevserokên meclisan û komûnan û welatiyên herêmê hat lidarxistin. Di civînê de Endama Rêveber a TEV-DEM'ê Medya Mihemed diyar kir ku federaliya demokratîk mîsogeriya mafên hemû gelan e û destnîşan kir ku pêvajoya nû wê pêvajoya avakirinê be. Civîn bi bersivandina pirsên gel bi dawî bû. **DIRBÊSIYÊ**

## Karkerên Rojava xwe bi rêxistin dikin

Sendîqaya Karkeran a girêdayî Komîteya Kedkaran a Qamişloyê di çarçoveya amadekariya konferansa xwe ya yekemîn de civînek li dar xist. Di civînê de Hevseroka Komîteya Kedkran a Qamişloyê Nebriya Mihemed diyar kir ku sendîqe saziyeke demokratîk, civakî û serbixweye. Nebriye Mihemed da zanîn ku armanca wan ew e ku kar û xeatên xwe li gorî hevpeymana civakî ya federaliya demokratîk bi rêxistin bikin. Di dawiyê de jî ji bo amadekariyên konferansê, komîteyek ku ji 5 kesan pêk tê hat avakirin. **QAMIŞLO**



## Artêşa tirk êrîşî gundên Kobanê kir

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku hêzên artêşa tirk a dagirker êrîşî gundên Kobanê kirine. Di daxuyaniya YPG'ê de hat destnîşankirin ku hêzên artêşa tirk di serê sibêha 6'ê çileyê de bi çekên giran gundê Qeremox û Girê Sor ên li rojhilatê bajarê Kobanê dikevin, bi dijwarî gulebaran kir. YPG'ê daxuyand ku têkildarî encamên gulebaranê de dê bi daxuyaniyekê raya giştî agahdar bikin. **KOBANÊ**



## Sersaxî ji malbata şehîd re hat xwestin

Endamê Rêveber ê TEV-DEM'ê Selah Firat, Hevserokê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Girê Spî Hemdan El Abid û nûnerên saziyên civaka sivîl jî di nav de bi dehan şêniyên Girê Spî, konê sersaxiyê yê ku ji bo şervanê HSD'ê Bahoz Berxwedan (Wesîm Ebadî) re hatibû vedan, ziyaret kir. Di merasîma sersaxiyê de sersaxî ji malbatê re hat xwestin û hat gotin ku bi saya têkoşîna şehîdan gelê herêmê di aramiyê de ye. Merasîma sersaxiyê bi berzkirina dirûşma 'Şehîd namirin' bi dawî bû. **GIRÊ SPÎ**



## Konferansa êzidiyan hat lidarxistin

Komeleya Êzidiyan a Efrînê bi dirûşmeya 'Kurdayetî neteweya min e û Êzidî ola min e' li Navenda Çand û Hunerê ya Efrînê bi tevlibûna endamên komeleyê, Endama Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger, Hevserokê Komîteya Olan Mihemed Kalo, Hevserokê Meclisa Rêveber a Efrînê Osman Şêx Îsa û gelek mêvanên din, hat lidarxist. Salona konferansê bi wêneyên Rêbertiyê, şehîdan û pankartên 'Kurdayetî neteweya min e û Êzidî ola min e' û 'Federalî mîsogeriya mafên hemû gelan e' hatibû xemilandin. Axaftvanan konferans li şervan û gelê êzidî pîroz kirin. **EFRÎN**



## Jinên Ciwan civakeke nû diafirînin

Yekitiya Jinên Ciwan a Kantona Cizîrê bi armanca birêxistinkirina jinên ciwan, di 20'ê kanûna 2015'an de li Dirbêsiyê Akademiya Jiyan û Amarayê vekirin. Li akademiyê heta niha 20 dewreyên ku ji 350 jinên ciwan pêk dihat, vekirine. Di dewreyê de waneyên 'Girîngiya perwerdeyê, dîroka jinan, civaka xwezayî, rastiya Rêbertî, neteweya demokratîk, federalî, Jinolojî û dîroka Kurdistanê' tên dayîn. Endamên akademiyê dan zanîn ku armanca wan ewe ku jinên ciwan xwe ji sîstema desthiladariya zilam rizgar bike û rola xwe ya pêşeng rabibe." **DIRBÊSIYÊ**

www.arsivakurdi.org

# Sosretiyên qeyûm

**Li Kurdistanê sosretiyên qeyûmên AKP'ê bi dawî nabin. Qeyûm di şaredariya Wanê de mêr tayînî Seroktiya Desteya Jinan kir. Li Erdîşê jî qeyûm tabeleya kurdî, ermenkî û tirkî rakir, li şûnê tabelaya tirkî daliqand**

Li şûna Hevserokê Şaredariya Mezin ê Wanê Bekîr Kaya ku rehîn hatiye girtin, Waliyê Wanê Îbrahîm Taşyapan anîbûn. Taşyapan jin kirine hedefa xebatên xwe.

Taşyapan piştî ku hate ser kar Mala Xwespartinê ya Jinan girtibû û niha jî karmendekî mêr danî ser Serokatiya Desteya Jinan. Her wiha Yekîneya Têkoşîna Tundiya li dijî Jinan a di bin banê şaredariyê de jî da girtin. Ev kirinên qeyûm di nav jinên xebatkar ên şaredariyê de bû sedema nerazîbûnan. Qeyûm, herî dawî jî polîtîkaya çûn û hatinê ya bêpere ku Şaredariya Mezin ji bo jinan li dar xistibû, rakir. Xebatkarên jin diyar kir ku bi van xebatan jinan dikine hedef û xwestin ku zû dest ji van kirinên xwe berdin.

**DIJMINÊ TABELAYAN**

Qeymeqamê tirk ê li Erdîşê Mehmet Şîrîn Yaşar, ku bi Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de wek qeyûm li Şaredariya Erdîşê ya DBP'yî bi cih bû, xwe li tabeleya "Rezên Aştiyê" ya bi kurdî, ermenkî û tirkî hate nivîsandin, ranegirt. Qeyûm tabelaya 'Rezên Aştiyê' şikand û li şûna vê tabelayê "1'ê Nîsanê" bi cih kir, ku di destpêka Nîsana 1915'an de qirkirina ermeniyan dest pê kiribû.

Di dema çandina mêwan de Hevşaredar Dîba Keskîn daxuyanî dabû, bal kişandibû ser Qirkirina Ermeniyan a Nîsana 1915'an û anî bû ziman ku tiriyê Erdîşê weke mîrateya Ermeniyan maye û gotibû, ew hêvîdar in bûyerên bi êş ên demên bihurî ji nû ve rû nedin. Keskîn bi xwe jî mêw çandibû û xwestibû bibe wesîle ji biratiya gelan re. Qeyûmê Yaşar, piştî ku şaredarî dagir kir, weke karê destpêkê hemû xebatên şaredariyê yên ji bo jin, zarok û ciwanan sekinandibû. *WAN - ANF*







# Esnaf heta qirikê deyndar in

Krîza aborî, pişta esnafên Mêrdînê jî şikand. Li bajêr gelek esnas ji neçarî derabeyên xwe danîne û esnafên li ser piya mane jî piraniya wan bêyî serfetihê bikin, roj li wan diçe ava.

Ji esnafanEkrem Berbecî yê ev 30 sal e esnaftiyê dike wiha diyar kir ku carinan ew qet serfetihê jî nakin û wiha axivî: "Em dikanê çawa vedikin, wisa jî digirin." Berbercî got, wî berê 400 lîre qezenc bi dest dixist û dest nîşan kir ku, niha ev daketiye 10 lîre yî. Bavê 3 zarokan Berbercî wiha temmî kir: "Bi zor û heft bela em îdare dikin.

Feyzî Bîrgun (69) ê li Sûka Kevn a Mêrdînê ev 60 sal e mêwefiroşiyê dike anî ziman ku, li sûka ku 2 sal berê ji mirovan xalî nedibû niha çivîk jî lê nafirin û wiha got: "Êdî hatiye wê rewşê ku, em nikarin bixebitin. Ji ber ev dikan ji bavê min ji me re maye naxwazim wê bigirim."

Arîf Altinoz wiha got: "Berê ruyê esnafan dikeniya, kar baş bû. Lê niha, hûn herin cem kijan esnafî hûn dibînin ku çay û cixareyê vedixwe. Serfetiha ji sedî sed bû, niha ne ji sedî 20 e jî. Em heta qirê di nav deynan de ne. Nêviyên refê me vala ne, em pêdiviyê bi tijekirinê nabînin. Salek du salên din jî em jî rêwî ne." *MÊRDÎN*




# Turîst êdî nayên Stenbolê

Li Tirkiyeyê ji ber rageşiya siyasî û geşedanên li herêmê 2016'an di turîzmê de kêmbûn çêbû. Ji sala 2000'an ve hêjara turîstên biyanî yên tên Stenbolê cara yekem ji sedî 26 kêm bû.

Di sala 2016'an de windahiya ji dahatuya turîzmê tê texmîn kirin ku 7.6 milyar dolar e. Li gorî daneyên ji aliyê Midûryeta Turîzm û Çandê ya Stenbolê ve hatine aşkera kirin, di hêjmara turîstên sala bihûrî ji sedî 35.2 kêmbûn çêbûye. Li gorî meha Çileyê ya 2016'an ji sedî 0.1 windahî çêbûye. Ji bilî wê di hemû mehan de hêjmara hatinan turîstan a Stenbolê kêmbûye. Di sala 2016'an de 9 milyon û 204 hezar turîst hatin herêmê û ev hêjmar di sala 2015'an de 12 milyon û 415 hezar bû. Hejmara tûristên tên Tirkiyeyê ji sedî 30.8 kêm bûye. Di nava salakî de 10 milyon turîst kêm bûn. *ENQERE*



## Hevşaredar hatin girtin

Hevşaredara Pasûrê Sadiye Suer Baran, piştî 11 rojan di bin çavan de ma hat girtin. Hevşaredarên Wêranşarê Emrûllah Cîn, Hevşaredarên Hewagê Zeynel Taş û Fatma Dogan jî hatin girtin.

Hevşaredara navçeya Pasûrê Sadiye Surer ku Walîtiyê peyvira wê ji destê wê girtibû li ser daxwaza Dozgerê Komarê di 26'ê Kanunê de hat binçavkirin û 11 rojan li Fermandariya Cendirmeyan di bin çavan de hat girtin. Suer Baran, piştî 11 rojan sewqî dadgehê hat kirin û hat girtin.

Li Rihayê piştî êrîşa li dijî Beşiktaşê ya Stenbolê di 12'e kanûnê de 250 siyasetmedardên kurd hatibûn binçavkirin. Ji kesên sewqî dadgehê hatin kirin Hevşaredarê Wêranşarê Emrullah Cin û Hevşaredarên Hewagê Zeynel Taş û Fatma Dogan bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" hatin girtin û şandin girtîgehê. **AMED - RIHA**

## Qeyûm tayînî Şaredariya Mahsertê kirin

Hat diyar kirin ku Wezareta Karên Hundir, piştî şaredarê navçeya Mahsertê Suleyman Tekin di çarçoveya lêpirsîneke Serdozgeriya Komarî ya Navçeyê de hat girtin, Qeymeqam Erol Korkmaz wekî qeyûm tayînî şaredariyê kir.

Piştî tayînkirina qeymeqam ji bo şaredariya Mahsertê, tîmên Midûriyeta Şaxa TEM'ê a Midûriyeta Navçeyê li avahiya şaredariyê lêgerîn kirin. Hat zanîn ku di dema lêgerînê polîsan avahiya şaredariyê dorpêç kirin. Hevşaredar Suleyman Tekîn û xebatkarên şaredariyê Hakki E., Sercan G. û Mehmet B. ên di 27'ê kanûna 2016'an de hatin binçavkirin û di 5'ê çileyê de hatin girtin. **MÊRDÎN**

## Operasyona tora civakî

Li Aydin û Xarpêtê 25 kesên ku di nav de rêveberên HDP'ê jî hene, ji ber parvekirinên xwe yên li ser tora civakê bi hinceta "propagandaya rêxistinê kirine" hatin binçavkirin. Li navçeya Efeler a Aydinê di saetên serê sibê de polîsan bi ser malan de girt û 10 kesên di nava wan de rêveberên HDP'ê jî hene parvekirinên wan ên li ser tora civakî hincet hatin nîşandan û hatin binçavkirin. Di çarçoveya operasyona ji aliyê Serdozgeriya Komarê yê Xarpêtê ve hatiye destpêkirin, li navend û navçeyên bajar polîsan di saetên serê sibê de biser malan de girtin. Hevseroka HDP'ê yê Xarpêtê Ayfer Yilmaz, Rêveberê Navenda navçeyê yê HDP'ê Nîhat Akdemîr, Hevserokê berê yê DBP'ê Turan Çelîk jî di nav de 15 kes hatin binçavkirin. Li navend û navçeya Samsat a Semsûrê jî 5 kesên ku ji aliyê cendirmeyan ve hatibûn binçavkirin sewqî dadgehê hatin kirin. 3 kes hatin girtin û 2 kes jî bi şertê kontrola edlî serbest hatin berdan. **DÎHABER**

## Ataturk çû Erdogan hat

Ajandaya ku her sal tê amadekirin û ji aliyê Serokatiya TBMM'ê ve li xebatkarên meclisê û nûçegihanên parlementoyê tê belavkirin, li gorî salên din di ya îsal de hin guherîn hatin kirin.

Ji dêvla portreyê Ataturk ê di ajandayên berê de, di ya îsal de wêneyekî wî yê reş û spî û dema diayan dike, cih girt. Piştî wêneyê Ataturk, di ajandaya 2017'an de cara ewil e ku wêneyê Serokomar Recep Tayyîp Erdogan jî cih digire. Piştî wêneyê Erdogan, portreya Serokê TBMM'ê Îsmaîl kahraman cih digire. Di ajandayê de tişta balê dikêşe yek jê ew e ku, wêneyê Ataturk li gel portreyên Erdogan û Kahraman biçûktir e. **ENQERE**

## Serokê TTB'ê yê Şirnexê hat binçavkirin

Li navçeya Cizîrê ya Şirnex Serokê TTB'ê ya Şaxa Şirnexê Dr. Azad Karagoz û Dr. Nesîm Sayim hatin binçavkirin. Polîsên ku bi ser mala Karagoz a taxa Konakê de girtîn ew xistin bin çavan. Sedema binçavkirina Karagoz û Sayim nehat zanîn û herdu bijîşk li Midûriyeta Polîsan a Cizîrê tên ragirtin. **ŞIRNEX**

## Li Riha û Stenbolê **42 kes hatin girtin**



Piştî êrîşa li Beşiktaşê herî dawî li Rihayê 35 û li Stenbolê jî 7 kes hatin girtin.

Piştî êrîşa li Beşiktaşa Stenbolê di çarçoveya operastonên binçavkirinên ên li dijî HDP û DBP'ê hatine destpêkirin de li Rihayê nêzî 250 kes hatibûn binçavkirin û koma ji 65 kesî pêktê derxistin dadgehê. Ji 24 kesên ku sewqî dadgehê hatin kirin 3 kes, ji 39 kesên di 3'ê çileyê de sewqî dadgehê hatin kirin 13 kes, ji 42 kesên di 4'ê Çileyê de sewqî dadgehê hatin kirin 18 kes bi îdîayên "endamên rêxistinê ne" û "propagandaya rêxistinê kirine" hatin girtin. Duh jî koma ji 65 kes pêktê ku di bin çavan de ne piştî 24 rojan sewqî dadgehê hatin kirin. Piştî dozger îfadeyên wan girtin 35 kes hatin girtin û 30 kes bi şertê kontrola edlî berdan.

Her wiha li Stenbole jî piştî 24 rojan 13 kes sewqî dadgehê kirin. Piştî îfadeyan 7 kes hatin girtin û 6 kes jî serbest hatin berdan. *AMED*

ROJEVA Medya
7 Çile 2017 Şemî

# Li Parîsê azadiya Ocalan hat xwestin



Li 2 navendên paytexta Fransa Parîsê di pêşengtiya endamên Jinên Ciwan ên Azad a Parîsê de, ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşeke bi meşaleyî hate lidarxistin.

Li Evry a Parîsê di pêşengtiya Jinên Ciwanên Azad de meşek bi meşaleyî hat lidarxistin. Bi sedan ciwanên ku li pêşiya avahiya Şaredariya Grîgnyê kom bûn, heta pêşiya lokala Navenda Civaka Kurd a Demokratîk a Evryê meşiyan. Di tevahiya meşê de ciwanan dirûşmên mîna "Bijî Serok Apo", "Jin, Jiyan, Azadî" û "Ciwan berê xwe bidin çiya, welat azad bikin" qîr kirin.

Li Vîllîers Le Belle jî Jinên Ciwanên Azad ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek li dar xist. Ciwanên ku li pêşiya avahiya Vîllîers Le Belle kom bûn heta Navenda Civaka Kurd a Demokratîk meşiyan û pankarta "Ji Ocalan Re Azadî" vekirin û bê navber dirûşmên "Bê Serok Jiyan Na Be", "Cîhaneke Bê Ocalan Em ê di Serê We de Hilweşînin" qîr kirin. **PARÎS - ANF**

## HDP dê nexşerêyê diyar bike

Dê HDP helwesta xwe ya têkildarî hevdîtinên teklîfa guherîna Qanûna Bingehîn ên wê roja duşemê li Lijneya Giştî ya Meclîsê pêk bên, di serê hefteyê de diyar bike.

Di 9'ê çileyê de roja ku dê teklîf bê Lijneya Giştî, dê parlameter li Meclîsê civîna xwe ya girtî çêkin û dê têkildarî muxalefeta hevdîtinan nexşerêya xwe diyar bikin. Encam û nirxandinên ji vir derkevin jî, dê roja sêşemê herî dawî bi civîna Lijneya Rêvebirinê ya Navendî li ser wan bê rawestandin.

HDP a ku di roja ewil de hevdîtinên teklîfê wek "guherîndina rejîmê" dinirxîne, dê di hevdîtinan de muxalefetiyeke bibandor bide der. Dê di dema hevdîtinan de hemû parlementer li Lijneya Giştî cihê xwe bigirin. Dê rewşa hevserok û parlementerên girtî bê destnîşankirin.

Li Meclisê hejmara parlamenterên AKP'ê 316 ye, ji bo xwe bigihîne 330'î pêdiviya wê bi 24 dengan heye. Li gel vê di nav MHP'ya xwedî 39 parlamenterî de jî bi roja ye krîza "erêkirinê" xwe dide der, lê ev krîz niha îstifa jî li xwe zêde kirin û her diçe kûrtir dibe. Di dema hevdîtinan de jî tim tê gotin ku, dê ev krîz fîreyan zêde bike û îhtimal e ku AKP xwe negihîne 330'î dengî. Ji ber vê yekê, dê HDP li gor encama dengdayînên tûra ewilîn biryara xw eyî beşdarbûna tûra duyemîn diyar bike. Yek ji sernavên rojeva HDP'ê jî, dengdayîna nepen e. Di vê çaroveyê de CHP'ê ji bo tevdîrgirtina dengdayînê nameyek ji Serokatiya Meclîsê re şand û HDP jî ji bo parlemnterên wan di dema dengdayînê de rengê dengên xwe diyar nekin dê çavdêriyê bike û heke bivê dê ji bo vê tev bigere. **ENQERE**

# Yekitî di rojeva eşîran de ye

**Li Wanê nûnerên eşîrên mixurî û milî bal kişand ser rewşa kurdên li çar perçeyan dijîn û girîngiya Kongreya Netewî ya Kurd a ku divê kom bibe, destnîşan kir**



Hecî Mutalîp Gazîogullari



Hecî Muzaffer Înan

Ji bo kombûna Kongreya Netewî ya Kurd peyamdayîn û bangewaziyên nûnerên herêmê didomin.

Ji rûspiyê eşîra mixurî Hecî Muzaffer Înan ê 90 salî hevdîtina dîrokî ya di 2013'an de li bajarê Selahaddînê yê Herêma Kurdistana Federal bi bîr xist û got, divê xebat nîvçe nemîne.

Înan ê di 90 sal temenê xwe de, Şerê Cîhanê yê Duyemîn, derbeyên di serdema Komarê de, gelek serhildanên kurda û komkujiyên hatine serê kurdan dîtine, anî ziman ku, dê sala 2017'an li gor salên din saleke bibereket be. Înan ê li navçeya Qelqeliyê xwedî gotin û rêzekê ye diyar kir ku ew geşedanên li Tirkiye û Rojhilata Navîn ji nêz ve dişopîne. Înan, Selahaddîn Eyyûbî yê di dîroka kurdan de xwedî cihekî girîng e rexne kir û wiha got: "Selahaddîn Eyyûbî xwedî cihekî girîng bû, lê hêza di dest xwe de tu carî ji bo kurdan, ji bo pêşeroja kurdan bi kar neanî. Di dîroka kurdan de 2 kes hene ku mirov wan dikare wek rêber qebûl bike. Yek Mela Mistefa Barzanî ye û yê din jî Abdullah Ocalan e."

**BIRYARA PÊŞEROJÊ**

Înan diyar kir ku, ew ji tirkî bêtir bi osmanî dizane û destnîşan kir ku, niha çewisandin û pêkutiyên li ser çanda kurdî yên dema Împaratoriya Osmanî û Komarê derbas kirine. Înan 11 Serokomarê Komara Tirkiyeyê û yê dawî Erdogan berawirdî hev kirin û wiha axivî: "Yek ji wan jî evqasî bi ser kurdan de nehat. Girtina Abdullah Ocalan û hevserokên HDP'ê bêedaletî ye. Li dijî ev qas êrîş û pêkûtiyan, tenê şerkirina ciwanan têr nake. Ev kar tenê bes bi kurdên her çar perçeyên Kurdistanê dibe û divê bi xwe biryara pêşeroja xwe bidin."

**FIRSENDA DÎROKÎ**

Înan siyaseta serokê PDK'ê Mesut Barzanî rexne kir û wiha domand: "Dibe ku Mesut Barzanî kurê Mela Mistefa Barzanî be, lê nûnertiya wî ya siyasî nekir. Bavê wî welatparêzekî rasteqîn bû û rêberekî wêrek bû. Gelek caran ji bo yekîtiya kurdan gav hatin avêtin, lê her tim kêm û nîvçe man. Niha hem PKK û hem jî Mesut Barzanî divê dawî li şerê nav xwe bînin û peywira dikeve ser milê wan bi cih bînin."

Înan anî ziman ku, gelê kurd ji bo vê xakê ji her gelî bêtir şer kiriye û wiha bang kir: "Heke kurd mil bidin milê hev û du, bawer dikim dê tu tişt xwe li ber wan negire. Gelê kurd bi rastî jî ji misilmaniyê bawer dike. mirovê misilman baweriya bi heqîqetê tîne, ji ber vê divê her kes ji bo heqîqetê bigihîje hev."

**PIŞTEVANÎ DIVÊ**

Ji rûspiyên eşîreta milî Hecî Mutalip Gazîogullari (84) jî diyar kir ku, sala 2017'an ji bo kurdan şêmûg e. Gazîogullari diyar kir ku kurd tenê dikarin bi piştevaniya di navbera xwe de hebûna xwe bidomînin û anî ziman ku, ew li Taxa Mor Çîçekê her cejn xwarinê li gund belav dike û dixwaze bi vî awayî peştevaniyê tim zîndî bike û wiha got: "Heke kurd bixwazin, tu sedemeke nikaribin bên gel tune ye. Ji Dêrsimê bigirin heta Zîlanê em tim hatin kuştin û me tim şerê hev kir. Divê kurd li vî şerê li her derî pêk tê, binihêrin û biryara ew ê çi bikin bidin. Sed sal berê em nehatin gel hev, lê niha firsend e, hemû hêzên kurd dikarin hêzeke hevpar ava bikin." ***WAN - DÎHABER***

## Dema bawerî qels dibe kaos rû dide

Hevserokê HDP'ê Selahattîn Demîrtaş têkildarî lêpirsîna ku bi îdîaya 'heqaret li serokomar kiriye' lê hat vekirin, parastina xwe kir. Dozgeriyê axaftina 9'ê Îlona 2015'an a li avahiya HDP'a Amedê ji Demîrtaş pirsî ku Demîrtaş di vê axaftina xwe de diyar kiribû, berpirsyariya siyasî ya xwîna serokomar û serokwezîr e. Demîrtaş parastina xwe ji Serdozgeriya Komarê ya Amedê re kir. Demîrtaş xwest siyasetmedarên gotin 'Pêvajoya çareseriyê qediya ye, ji niha û şûnde çareserî tune ye' bê tespîtkirin. **AMED**

# Rewşa tenduristiyê ya Turk cidî ye!

Hevşaredarê Bajarê Mezin a Mêrdînê Ahmet Turk 47 roj in li Girtîgeha Sîlîvrî ya Stenbolê girtî ye. Komîsyona Hiqûqê ya DBP'ê, li ser rewşa tenduristiyê ya Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Rewşa tenduristiyê ya Hevşaredarê me yê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Birêz Ahmet Turk hê cidî ye. Daxuyaniyên ji aliyê rayedaran ve tên dayîn, tirs û fikarênme zêde dikin.Tevî ku tê zanîn rewşa tenduristiyê ya Hevşaredarê me Turk hê cidî ye, bernedana wî derbê li wijdanê civakî dixe." Parêzer Zeynep Ceren Boztoprak a ku li girtîgehê



serdana Ahmet Turk kir, diyar kir ku herî dawî Turk derketiye revîra girtîgehê û wiha got: "Ji ber di qelbê wî de pûl heye, dema di cîhaza X-Rayê re derbas dibe qelbî wî nerihet dibe. Ev jî bandoreke neyînî li tenduristiya wî dike. Bozkûrt balê kişand ser gotinên Ahmet Turk ên di her hevdîtinê de diyar dike û wiha got: "Wiha dibêje: 'Ne hewce ye ewqas pirgirêka min a tenduristiyê derxin pêş. Divê ev tişt nebin rojev." **STENBOL - DÎHABER**

## Ev kaos mizgîniya azadiyê ye



Bêje

**Îskan Şîvhelan**

Rojeva welatê me gelekî germ derbas dibe. Em her roj li pêşketinên nû hişyar dibin. Têkoşîn, êrîş, komkujî, berxwedan, xemgînî û mizgînî li ser hev tên.

Baş e gelo ma ev tenê para me ye?

Na!

Li Tirkiyeyê binêrin.

Li Iraqê binêrin.

Li Sûriyeyê binêrin.

Li gelek deverên cîhanê binêrin.

Cudahî hebin jî heman kaos berdewam dike..

Pergala modernîteya kapîtalîst di nav qeyraneke mezin de ye. Rêya jêderketina qeyranê jî wekî kûrkirina şer dibîne. Ji bo vê yekê li hemû deverên cîhanê şer û pevçûn hene.

Baş e gelo em wek gelê kurd divê çi bikin û çawa tev bigerin.

Şerê modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn kûr bûye.

Kurdistan jî dilê Rojhilata Navîn e. Hem jî dilekî ku ji hêla çar dewletên Rojhilata Navîn ve hatiye parçekirin.

Ev tê çi wateyê?

Wetaya vê zelal e. Niha ev herêm ji nû ve teşe digire. Sînorên sed sal berî niha li gorî berjewendiyên hêzên serdest hatine xêzkirin, serobino dibin. Sînorên nû tên xêzkirin.

Divê kes li bendê nebe ku ev pêvajo bê êş û zehmetî derbas bibe. Şerê teşedayîna cîhanê hatiye li ser axa me çêdibe.

Em dê êşên mezin bikişînin, bedelên mezin jî bidin. Çima?

Li Îranê binêrin, xwedî dewlet in, nasname, çand û hebûna wan di bin tu talûkeyan de nîn e. Lê li Yemen, Iraq, Urdun û Sûriyeyê şer dike.

Rûsya bi heman awayî.

Amerîka bi heman awayî.

Tirkiye bi heman awayî.

Siûd, Katar û hwd. Em dikarin lîsteyê dirêj bikin.

Li gorî van welatan sedemên me yên têkoşînê pir zêdetir in.

Çi ne sedemên me?

Axa me dagirkirî û parçekirî ye.

Ziman û çanda me qedexe ye.


Hebûna me di bin talûkeyê de ye û wek gelekî 40 milyon em bê statû ne.

Niha rewşeke ku gelek avantaj bi xwe re anîn, li pêşiya kurdan e. Kurd nikarin bibêjin "Bila em zehmetiyan nekişînin, em ji têkoşîn û bedelan feraqat bikin". Dema wisa got dê sed salên din winda bikin û careke din firsendeke wiha bi dest nexin. Gelê kurd li gorî sed sal berê gelekî bi avantajtir e. Hêza wî ya leşkerî, rêxistinî gelekî mezintir e. Yekem car e ji hêzên navdewletî jî piştgiriyê digire. Ji bo vê yekê êş û bedel çi qas giran bin jî kurd nikarin dest ji têkoşînê berdin. Kurd neçar in vê firsenda sedsalê bi kar bînin. Di van 5 salên dawîn de destkeftiyên mezin bi dest xistin.

Tenê kêmasiyek maye. Yekitiya kongreyeke neteweyî. Kurd yekitiya xwe pêk bînin, dê bibin serwerên Rojhilata Navîn. Ji bo vê divê her kurdek bi hêvî û moral be. Divê her kes çi ji dest bê bike. Biçûk û mezinên têkoşînê tune ne. Gotineke biçûk jî, gaveke biçûk jî, diayeke xêrê, vegotina avantaj û dezavantaj, talûke û şansê li pêşiya me jî gelekî girîng e. Divê em hemû xeyidîn, kêmasî û nebesiyan ji holê rakin, hevpariyan bi pêş bixin. Binêrin tu zilmkar û dagirker nikarin li pêşiya têkoşîna we bisekinin. Dagirker dihejin, Rojhilata Navîn diheje. Lê nenêrin diqîrin, qîra wan ji tirsa wan e. Bawer bikin ji vê kaosê dê azadî derkeve.Tenê hûn morala xwe bilind; hevgirî, piştgirî û têkoşîna xwe xurt bikin.

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
7 Çile 2017 Şemî



# ‘Ocalan terkî bêdengiya tecrîdê hat kirin’

**Tecrîda girankirî ya li ser Ocalan ji 5’ê nîsana 2015’an heta niha didome. Buroya Hiqûqê ya Sedsalê di rapora xwe ya 2016’an de aşkera kir ku birêz Ocalan di tevahiya salê de terkî bêdengiya tecrîda giran hatiye kirin**

YASÎN KONBULAN / STENBOL - DÎHABER

Buroya Hiqûqê ya Sedsalê der barê şert û mercên Ocalan ên li Girtîgeha Îmraliyê yên 2016’an de raporek amade kir. Di raporê de wiha tê gotin: “Îmrali di 2016’an de terkî tecrîdê hat kirin.”

Buroya Hiqûqê Ya Sedsalê, têkildarî Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F a Îmraliyê û şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên sala 2016’an de raporeke ku ji 1’ê çileya 2016’an heta 15’ê tîrmeha 2016’an û raporeke din jî ku ji 15’ê tîrmeha 2016’an heta 31’ê kanûna 2016’an digire nava xwe, amade kir. Buroyê da zanîn ku mînaka herî şênber a tecrîdê li Îmraliyê tê dîtin û ev tespît kir: “Hemû binpêkirinên li Îmraliyê, wek hiqûq û pîvanên zagonan tên nîşandan.” Di raporê de tê gotin ku Tirkiyeyê hin biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) yên der barê Ocalan de pêk ne anîne. Parêzeran da zanîn ku piştî hewldana darbeya 15’ê Tîrmehê, ji Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) xwestiye ku biçin li Îmraliyê lêkolînê bikin lê CPT’yê ev daxwaz red kiriye.

Di berdewama raporê de ev tişt hatine tespîtkirin: “Muvekkîlê me birêz Abdullah Ocalan, ji 15’ê tîrmeha 1999’an heta niha di Girtîgeha Îmraliyê de tê girtin. Di vê demê de bi dehan sal bi tenê û di hucreyê de hat girtin. Ev şert li dijî qedexeya îşkence û muameleya xerab bû. Piştî 10 salan di 17’ê mijdara 2009’an de 5 girtî şandin Îmraliyê. Ji bilî birêz Ocalan 5 muvekkîl di 15’ê adara 2015’an de sewqî Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdag û Kandirayê hatin kirin. Bi qasî di çapemeniyê de jî hat parvekirin, 5 girtiyên nû ku wek ‘sekreterya’ hatin binavkirin di 17’e adara 2015’an de neqlî Girtîgeha Îmraliyê hatin kirin. Ji van girtiyan birêz Nasrullah Kuran û Çetin Arkaş di 26’ê kanûna 2015’an de di saetên şevê de ji girava Îmraliyê li dijî daxwaza wan ew derxistin û di 27’ê kanûna 2015’an de şandin Girtîgeha Hejmar 9 a Silîvriyê. Ji vê sirgûnê bi awayekî tesadufî di 5’ê çileya 2016’an agahî çêbûye. Ji 6’ê çileya 2016’an û şûnde parêzeran her roj serî li Dozgeriya Înfazê ya Girtîgeha Silivriyê û midûriyeta girtîgehê da lê 6 rojan qet hevdîtin pêk nehat. Di 11’ê çileya 2016’an de hevdîtin ji derveyî pîvanên hiqûqê di bin qeydê de tenê 15 deqîqeyan pêk hat. Şertên li Îmraliyê êdî li girtîgehên din jî hene.”

**SÎSTEMA HUCREYÊ**

Di berdewamê de jî ev tişt hatin parvekirin: “Piştî van geşedanan li Îmraliyê ji bilî Ocalan, birêz Omer Hayri Konar, birêz Veysi Aktaş û birêz Hamîlî Yildirim jî her yek li hucreyekê hatin bicihkirin û ji hev hatine qutkirin û îzolekirin. Rojê tenê saetekê di hewşa hevpar de hev dibînin.

Derfetên li girtîgehên din, li Îmraliyê nakevin meriyetê. Têkiliya Îmraliyê ji cîhanê hatiye qutkirin, mafên jiyanê hatine astengkirin û tu agahî nayên wergirtin. Mafê hevdîtina malbatê, hevdîtina 3 hevalan ên rû bi rû û telefonê mafên bingehîn in. Lê ji 2016’an ve Ocalan ji hemû mafan bê par hat hiştin. Di vê navberê de parêzeran tu hevdîtin û têkiliya bi telefonê re pêk neanîne. Tenê carekê birayê Ocalan di 2016’an de hevdîtinek pêk anî. Ev jî nîşan dide ku li Îmraliyê tecrîdeke xweser heye.

**BIRYAR BINPÊ KIRIN**

Buroyê da zanîn ku di 18’ê adara 2014’an de DMME’yê der barê serlêdanên Ocalan ên hêjmar 24069/03, 197/4, 6201/06 û 10464/07’an de biryara ‘rewşa Ocalan tê de işkence û muameleya xerab e’ daye û wiha dom kir: “Ocalan di nav van şertan de 17 sal derbas kirin û kete sala 18’an. Ev rewş di 16’ê hezîrana 2016’an de bi raporekê ji Komîteya Wezîrên Konseya Ewropayê re hatiye ragihandin.”

Buroya hiqûqê destnîşan kir ku ji bo hevdîtinan bi Ocalan re parêzeran ji 27’ê tîrmeha 2011’an heta niha bi sedan caran serlêdan kirine lê hatiye redkirin û ev agahî hatin dayîn: “Ji 1’ê çileyê heta 15’ê tîrmeha 2016’an 57 caran serlêdan hat kirin. Ev serlêdan, 47 caran bi hinceta ‘keştî xerabe ye’, 10 caran jî bi hinceta ‘muxalefeta hewayê’ hat redkirin. 26 serlêdanên malbatê jî bi heman hincetê red kirin. Di vê çarçoveyê de buroya me encamên serlêdanên parêzer û malbatê yên di navbera meha çileyê heta tebaxa 2015’an û heta çileya 2016’an, di navbera nîsana 2015’an heta nîsana 2016’an de CPT agahdar kir. Piştî van geşedanan CPT’yê di navbera 28-29’ê nîsana 2016’an de Îmrali ziyaret kir lê rapora CPT’e hêj nehatiye parvekirin. Hewldana CPT’ê bandor li ser tecrîdê nekir. Di hezîrana 2016’an de têkildarî tecrîdê serî li Raportorê Pêşîlêgirtina Îşkenceya Neteweyên Yekbûyî hat dayîn lê heta niha gavên erênî neavêtin.”

Têkildarî rewşa piştî hewldana darbeyê ya 15’ê tîrmehê jî buroyê ev agahî dan: “Piştî ragihandina OHAL’ê di 21’ê tîrmeha 2016’an de û weşandina 12 Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de (KHK) bi awayekî fermî, li girava Îmraliyê ji bo hevdîtina parêzer û malbatê dijhiqûqî pêş ketin. Li aliyê din hêj biryarnameya OHAL’ê derneketî li Îmraliyê ‘biryara astengkirinê’ pêk hat.”

**BIRYARÊN DADGERIYÊ**

Di 21’ê tîrmeha 2016’an de 1’emîn Dadgeriya Înfazê ya Bursayê bi biryara xwe ya 2016/56 D. têkildarî Îmraliyê biryarên ‘Qexedekirina serdanan, astengkirina ragihandina nivîskî û telefonê û astengkirina belgeyên ku parêzerên girtiyan bidin’ hatin girtin. Buroyê ragihand ku tevî ku hevdîtina parêzer û muwekîlan mafeke mîsoger be jî ev biryar bi awayekî bê hiqûqî hatiye girtin û wiha domand: “Me li dijî vê îtîraz kir lê 2’yemîn Dadgeha Cezaya Giran a Bursayê ve bi biryara 26.07.2016 û 2016/1127 D. ev îtîraz red kir. Li ser vê biryarê di 27.10.2016’an de di çarçoveya mafê şexsî de serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn (AYM) hat dayîn. AYM’ê ‘daxwaza tedbîrê’ red kir lê der barê esasê de hê jî biryar nedaye.”

**FIKARÊN DARBEKARAN**

Buroyê destnîşan kir ku piştî ku nûçeyên ‘Planên Îmraliyê yên darbekaran’ hatin weşandin fikarên ji bo ewlehiya canê muwekîlan zêdetir bûye û wiha dom kir: “Di nûçeyan de hat gotin ku ‘Di şeva darbeyê de dê Îmrali bihata bombekirin’ û ‘Dê Ocalan bihata revandin’ hatin weşandin. Li ser vê yekê serlêdana parêzeran a ku her roj tê nûkirin, heta 21’ê tîrmehê bê bersiv hat hiştin û piştre jî biryara 1’emîn Dadgeriya Înfazê ya Bursayê hincet hat nîşandan û redkirin. Ev biryar ji bo astengkirina hemû mafan wek hincet tê nîşandan. Di KHK’yan de jî ji bo astengkirina hevdîtina parêzeran tu qedexe tune ye.”

## CPT neçû giravê

**BUROYA HIQÛQÊ** ya Sedsalê di berdewamê de daxuyand ku ji bo geşedanên ku fikarên civakê zêdetir ji holê bên rakirin li Tirkiyeyê bi gelek rêxistinên civakî yên sivîl, rêxistinên mafan re hevdîtin pêk hat û serlêdan hatine kirin û ev agahî parve kirin: “Dîsa di 19’ê tîrmehê û 26’ê tîrmeha 2016’an de serî li CPT’ê hat dayîn û hate xwestin ku bi awayekî lezgîn biçin Girava Îmraliyê. CPT di 29’ê tebax – 6’ê îlona 2016’an de hate Tirkiyeyê. CTP neçû Îmraliyê û bi daxuyaniyekê ragihand ku der barê rewşê de bi rayedaran re hevdîtin kirine. Ji ber vê yekê 50 siyasetmedarên kurd, ji bo agahiyekê ji birêz Ocalan bigirin dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kirin. Greva ku di 5’ê îlona 2016’an de dest pê kir, bi hevdîtina birêz Mehmet Ocalan a bi muewkîlê me ya di 11’ê îlona 2016’an de bi dawî bû. Ji 6’ê cotmeha 2014’an heta niha ev hevdîtina yekemîn a malbatê bi birêz Ocalan re bû. Birêz Mehmet Ocalan got ku rewşa birayê wî başe û di 15’ê Tîrmehê de tu mudaxale li wan hatiye kirin. Piştî vê hevdîtinê careke din serlêdan hatin red kirin û Îmrali heta 2016’an dîsa ketiye nava bêdengiya tecrîdê. CPT di 16’ê kanûna 2016’an de dîsa der barê serlêdanên malbat û parêzeran ên di navbera 19’ê tîrmeha 2016 heta 25’ê mijdara 2016’an de hatiye agahdarkirin. Di navbera 15’ê tîrmeha 2016’an heta 31’ê kanûna 2016’an 62 serlêdanên parêzeran û 54 serlêdanên malbatê ji aliyê 1’emîn Dadgeriya Înfazê ya Bursayê hatiye redkirin.”

## Encama raporê

**DI DAWIYÊ DE** jî Buroya Hiqûqê ya Sedsalê got ku Saziya Înfazê ya Cezayê ya Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê, bi rejîmeke ku derveyî maf, azadî, rêgez û rêbazên derveyî hiqûqê tê birêvebirin û ev nirxandin kir: “Kiryarên mîna qedexekirina parêzeran, sînorkirina roj û dema hevdîtina bi pêrazêran re, tevlibûna rayedarên hikumetê ya hevdîtina parêzer û muwekîlan, desteserkirina belgeyên parêzeran, qeydkirina bi dîmen û bi deng a hevdîtina parêzer û muwekîlan bi dîmen û deng qeydkirin pêk tên. Bi awayekî derqanûnî ji hezîrena 2005-27’ê tîrmeha 2011’an de li Îmraliyê hevdîtina bi parêzeran tê astengkirin. Pêkanînên li Îmraliyê piştî hewldana darbeyê û bi OHAL û KHK’yan tên qanûnîkirin. Ev jî nîşan dide ku pêkanînên beriya OHAL’ê hemû dijqanûnîne. Her wiha nîşan dide ku Îmrali her dem bêqanûn û di statuya OHAL’ê de bû. Em dixwazin bi bîr bixin ku Îmraliya ku di nava rejîm û hiqûqa asayî de bû, di 2013-2015’an de cihê hevdîtinên fermî û qanûnî yên pêvajoya çareseriyê ye û Birêz Ocalan aktorê sereke yê vê pêvajoyê ye. Pêvojaya ku ji 5’ê nîsana 2015’an qut bû, bi xwe re şerekî dijwar anî. Domkirina tecrîda li Îmraliyê tê wateya qelskirina jiyana demokratîk û aştiyane.”









ÇAND & Huner
7 Çile 2017 Şemî

## ‘Kêliya Dem Radiweste’

**NIVÎSKAR DONALD MARGULIES** ê xwedî Xelata Pulitzerê, hemû êş û bûyerên xemgîn ên li Rojhilata Navîn di ‘Time Stands Still’ (Kêliya Dem Radiweste) de berhev kirin. Lîstik li ser jiyana du hevjînan e ku rojnamegeriya şer dikin. Nûçegihana wêneyan Sarah demeke berê li Iraqê di teqîneke bombeyî de bi giranî birîndar dibe û piştî demekê di nexweşxaneyê de dimîne û ji nexweşxaneyê hêj derneketiye. Sarah ji hêlekî ve hewl dide serederiyê li birîndariya xwe bike, ji hêlekî ve jî dixwaze bandora wê xemgîniyê ji ser xwe biavêje. Lîstik di 27’ê çileyê de dê li Altkat Sanatê bê pêşandan. **STENBOL**



# Gundê şewitî û suryanî di bîra wî de man

*Wênesaz Ramazan Îlter got ku wênexêzkirin hezek e ku ji zarokatiyê ve lê peyda bûye û wiha axivî:* *<u>“Wêneyê min ewil xêz kir, wêneyê gundê me yê bi darê zorê em jê hatim koçberkirin ê Çattepeyê bû”</u>*




Di serdema piraniya gundên dihatin şewitandin û valakirin de, Ramazan Îlter û malbata xwe jî ji aliyê leşkeran ve ji gundê Çattepeyê yê girêdayî Misirca Sêrtê, di 1995’an de bi darê zorê tên derxistin û li Êlihê bi cih dibin. Dema tên Êlihê, Îlter wê xeyala xwe ya zarokatiyê ya wêneçêkirinê bi çûyîna kursekê pêk tîne. Îlter travma, êş û azarên ji zarokatiyê ve dîtine, xêz dike de wiha dibêje: “Bila mirov li koka xwe, li xwe xwedî derkevin. Divê bibêje ji ku hatim, ez ê biçim ku derê, divê qethiyen koka xwe winda neke.”

Îlter diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe ve bi wêneyê ve girêdayî ye û ev tişt got: “Min di tabloya xwe ya ewilîn de, gundê xwe yê em bi darê zorê jê hatin koçakirin, xêz kir. Dema bavê min tablo dît zehf hestiyar bû. Dest bi vegotina gund kir. Xêzên wêneyî nîşan didan û digot, ‘Mala me li vir bû, li vir ev tişt qewimî.’ Yanî yeko yeko bîranînê xwe vegotin. Min jî ew tabloya ewil diyarî bavê xwe kir.”

**SEFARÊN SURYANÎ**

Îlter bîranîneke zarokatiya xwe jî piştî salan xêz kiriye û di vê derbarê de jî wiha diaxive: “Ev wêne jî ji dema zarokatiyê maye. Dema zarok bûm, ji hêla Mêrdînê sefarên suryanî dihatin gundê me. Sefarên di biharê de dihatin, li ber agirê êzingan qûşxane û sîtilên me yên reşbûyî paqij dikirin. Ev wêneyê min çêkiriye, salê carekê dibû. Dema biçûk bûm di bîra min de maye.”

Îlter anî ziman ku wêneyên wî hene û hêvî dike ku dê di demên pêş de pêşangehekê veke. Îlter derbirî ku pêkanînên di demên dawîn de bandoreke payîzî li ser kiriye û wiha behsa wêneyekî ku xêz kiriye kir: “Min hewl da gundekî rûxandî xêz bikim. Min ew gund wek Laleş nîşan da. Payîzeke bihuzn bi ser xwemaliya jina kurd de hatiye. Min bi sekn, cudahî û kincên wê îdealîze kir. Jina kurd her tiştî heq dike. Hem fedakar e, hem dayik e, hem jî li hemû qadên jiyanê pêşeng e.”



Îlter girêdana bi koka xwe ve û jî gelekî girîng dibîne û got ku divê mirov xwedî li koka xwe derkeve. ***ÊLIH - DÎHABER***

## Ji herêma Dursunbeyê cilên gelêrî




Civakên li Kurdistan û Tirkiyeyê dijîn, di serî de ji aliyê çand û hunerê ve, di gelek qadên jiyanê de dişibin hev. Cil û bergên li ser van jinên ciwan, xurcikên ku bi hatine çêkirin, balîf, nivîn û xawliyên ku bi kedeke mezin hatine neqişandin, ên herêma Dursunbey a Kutahyayê ne. Ev cil herî zêde di folklorê de tên bikaranîn. Li Kurdistanê jî li her herêmê cil û bergên taybet tên dîtin û di rojên şahiyê de bi reng û nexşên xwe mirovan sermest dikin. Bi têkoşîna azadiya Kurdistanê re cil û bergên gerîlayan jî gelekî tên ecibandin. Lê ev ji bo dewleta tirk derbasdar nîn e. Dema dewleta tirk wan cilên gerîlayan dibîne, wek gayê çav bi paçê sor ketî, êrîş dike. **AMED**

## Xelatên pêşbirka stranan diyar bûn




Pêşbirka Stranên Notaya Zêrîn a ji hêla Şaredariya Bajarê Mezin a Antalyayê ve tê lidarxistin, îsal cara duyemîn hat lidarxistin. Xelatên ku tên dayîn jî diyar bûn. Dê ji kesê/a yekemîn re 4 hezar lîre bê dayîn û bi giştî dê 24 hezar 500 lîre bê belavkirin. Pêşbirka ji hêla Serokatiya Daîreya Karên Civak û Çandî ve tê lidarxistin, armanc dike ku dengên nû tev li muzîka tirkî bike û strannivîsên nû bi pêş bixe. Pêşbirk îsal cara 2’yemîn hat lidarxistin. Kesên ketin dereceyê ji kesê yekemîn re 4 hezar, ji yê duyemîn re 3 hezar 500, ji yê sêyemîn re 3 hezar û ji 7 berheman re jî xelata mansiyon 2 hezar TL hat dayîn. **ANTALYA**

## Zimanê li ber tunebûnê ‘romeika’



Hunermend Apolas Lermi xwedî albumên wek ‘Kalandar’ û ‘Santa’ ye û herî dawî di sala 2016’an de albuma bi navê ‘Romeika’ derxistibû. Album bi etîketa Anadolu Muzîkê hat weşandin. Oeydên albumê li Tirkiye û Yewnanistanê hatin kirin û ji stranên rûmî û yewnanî pêk tên. Di albumê de Lermi bi hunermendê ji herêma Deryaya Reş, Pela Nikolaidou re duetê dikin. Dîsa di albumê de helbesteke Vahit Tursun jî heye. Her wiha ji derveyî muzîkên Deryaya Reş, straneke Îzmîrê jî tê de cih digire. Romeika tê wateya ‘zimanê romê’ û li herêma Deryaya Reş wekî zimanê herêmî tê zanîn. **RÎZE**

# Berî fesadan hemû xwişk û bira bûn

HACI YUSUF TOPALOGLU / SEMSÛR - DÎHABER

Ferîde Bektaş a bîranînên xwe yên “Taxa Gawiran” a Semsûrê nivîsand, got bîr û baweriyên ku heta beriya şerê Kibrisê li taxê wek xwişk û bira bi hev re dijiyan yeko yeko winda bûn.

Hemşîreya kedkar Ferîde Bektaş aşkera kir ku li taxa Marayê (Taxa Gawiran) suryanî, ermenî, kurd, tirk, misilman, xiristiyan, sunî û elewî bi hev re dijiyan. Bektaş bîranînên civakî di pirtûka xwe ya bi navê ‘Gavûr Mahallesî Adiyaman’ (Taxa Gawiran Semsûr) de berhev kirin. Bektaş piştrast kir ku piştî şerê Kibrisê yê 1974’an cîranên wan ên xiristiyan tirsiyane û tax terk kiriye û bi vê terkkirinê re raçinga taxê hêdî hêdî guheriye.



Nivîskar Bektaş, berî navê ‘Gavûr Mahallesî’ li pirtûka xwe bike, ji bo dilê cîranên wan ên xiristiyan nemîne bi awayekî fermî serî li Metropolîtîka Semsûrê daye. Her wiha li gel vê pirtûkê, bi navê ‘Bekleyîş’ (Bendewarî) pirtûkeke helbestan, bi navê ‘Kod Adi Efsûn’ (Navê Kod Efsûn) pirtûkeke zarokan û ‘Geçmîş Olsun Bîr Hemşîrenîn Anilari’ (Derbasî Be, Bîranînên Hemşîreyekê) pirtûkeke ku serdema 12’ê Îlonê vedibêje nivîsandine û bi giştî 4 pirtûkên Bektaşê hene.

Ferîde Bektaş diyar dike ku dema navê taxa Gawiran a Semsûrê tê gotin, ji 7 salî heta 70 salî her kes taxê dinase û wiha got: “Dema dibêjin Taxa Marayê kes nas nake. Divê bibêjin Taxa Gawiran. Ji bo çi jê re dibêjin ‘Taxa Gawiran’? Wek taxeke kozmopolît; suryanî, ermenî, nasranî lê dijiyan. Ji ber ku piranî gelê xiristiyan li dora dêrê rûdiniştin, gel jê re digot Taxa Gawiran. Tercîhên wan cuda bûn, lê heman tax parve dikir.”

**JIYANEKE HEVPAR**

Bektaş sedema nivîsandina Taxa Gawiran jî bi van gotinan vedibêje: “Dema min dest bi nivîsandina vê pirtûkê kir, nexweşîna alzheîmerê ya diya min pir giran nebûbû. Destpêka nexweşînê bû. Diya min tim behsa berê dikir. Li gel vê, her diçûm cem diya xwe û dihatim, ew avahiyên xerabe, texrîbkirî yên li taxê te digot qey bi min re diaxivîn. Hesteke wisa xwe li min radipêça. Li ser vegotinên diya xwe min xwest wan di tehma romanekê de binivîsim.”

Bektaş piştrast kir ku gel hemû bi hev re diçûn şîn û şahiyên xwe û jiyaneke bi hev re hebû. Bektaş anî ziman ku beriya bûyerên Kibrisê her tişt xweş bû, lê piştî bûyeran her tişt guherî û jiyana civakan serobin bû.

## Koma Jinên Destrengîn

Berpirsa Koma Jinên Destrengîn ên Helebçeyê Sindûs Hisên ragihand ku armanca wan a damezirandina vê komê komkirina jinên dest rengîn û çêkirina karê hunera destan e. Endama komê Hûsna Mehmûd jî got ku ew di karê wêneyan de baş e û girîngiyê dide vê komê.

Koma Jinên Destrengîn ên Helebçeyê, ji hejmareke jinên çalakvan û jinên di karê wêne, peykertraşî, dûrîtina cilan de jêhatî, pêk tê. Di sala 2015’an de hatiye damezirandin. Niha jî projeyekê çêdikin ku ji kelûpelên xirab hatin avêtin, berhemên hunerî biafirînin.

Berpirsa Koma Jinên Destrengîn Sindûs Hisên der barê armanca damezirandina vê komê de ji ajansa Rojnewsê re axivî. Sindûs da zanîn ku armanca wan a damezirandina vê komê ew e ku di aliyê çand û hunerê de xebatan bi pêş bixin û wiha got: “Ew jinên ku ji bo wan derfet nehatiye dayîn ku berhemên xwe nîşan bidin, li rexmê vê me xwest bi vê komê rolê jinan derxin pêş û jinên di malê de hatine hepskirin, tev li xebat û jiyanê bikin.”

Sindûsê piştrast kir ku ji niha ve projeyek li ber destê wan heye, bi kelûpêlên xirab ên ji aliyê kesan ve hatine avêtin, ew kom kirine û di vê derbarê de jî ev tişt got: “Bi vê yekê me xwest em bi huner û ciwankariyê pêşangehekê vekin. Her wiha gelek caran gel jî bo kirînê tê, dikirin û bi malên xwe ve dikin.” **HELEPÇE**



www.arsivakurdi.org

# Şengal yê şengalijan o

**Ma şînayêne sernuşteyê nuşteyê xo bi hawayo *'Şengal yê şengalijan o'* binuştêne; çimkî çîyêko ma wazenî vajî, no yo**



KASIM ENGÎN

Şengal zaf yeno munaqeşekerdiş û Şengal ser o zaf çîyî yenî qiseykerdiş. Çîyo ecêb o yo ke kesê ke wazenî Şengalî yew kewçika awe de bifetesnî, daxî qala Şengalî kenî. Wexto ke wina bî, newe ra qala Şengalî kerdiş, beno lazimîyêk.

Ma destpêke de vajî ke tarîxê Kurdistanî tarîxê qirkerdişan o. Labelê mîyanê nê qirkerdişan ra yê ke tewr dejin û trajik î, bi Şengal eleqeder î. Çimkî heta tarîxê nizdî zî her tim vera Şengal de polîtîkayê qirkerdiş û çinkerdişî dewre de bîy.

Ewro tarîx nîşanê ma dano ke Osmanîyan bi desan reyan êzidîyê ke Şengal û sewbîna cayan de cuyaynê ser de hêrişê ke hedefê înan de qirkerdiş estbî, kerdo. Labelê reyna tarîx nîşanê ma dano ke kurdê ke xo sey misilman şinase kenî zî bi desan reyan êzidîyan ser de qirkerdişî viraştî.

Yê bîn zî tarîxê Kurdistanî ma nawneno ke heta 200 serrî verê zî zafaneyê kurdan êzidî bîyo. Labelê eke ewro hûmara êzidîyan bi sehezaran yeno şinasekerdiş, o wext tîya de polîtîkayê cîdî yê qirkerdişî ameyî cuyayîş. No bi hawayo aşkere yeno famkerdiş.

Qirkerdişê serra 2014î seba ke tarîxêko nizdî de virazîya, ma heme bîyî şahidê nê qirkerdişî. Labelê her çiqas vera çimanê ma hemînan de qewimîya zî, merdim nêeşkeno vajo ke qirkerdiş hetê ma hemînan ra bi hawayo raşt ameyo famkerdiş. Hema zî yê ke birînanê verênan wirnenî û nê kesî bi no hawa şaro ke tarîxê înan bi qirkerdişan pirr o, dejnenî. Kesê ke wina bi hawayo qure nizdîyê êzidîyan benî, estî û nê hetî nê nizdîbîyayîşê xo ra zî fek veranêdanî.

Çîyêko ma wazenî vajî no yo; şaro ke raştê hende qirkerdiş û kiştişan ameyo, êdî goreyê waştişê her kesî bawerîya xo her kesî nêano û mecbûr nîyo ke bi her kesî bawer bikero zî. Eke êzidîyî wazenî xo bi xo ewleyîya xo bigirî, o wext tena çîyêko bêro kerdiş esto, o zî, rêzgirewtişê nê waştişî rê yo. Ganî her kes nê qerarî rê rêze bigiro.

Heqîqeto ke ma vanî 'Şengal yê şengalijan o' zî no yo. Heto bîn ra êzidîyî tarîx ra nata firsendêko ke bişînbî goreyê raştî û heqîqetê xo bicuyî, tepiştî û rêxistinîya xo zî heta cayêk ardî. Hetta partîya xo daxî awan kerdî û hêzê xo yê pawitişî –no hêz cinî û camêrdan ra pê yeno- awan kerdî. Reyna cêr ra heta cor meclîsanê xo daxî awan kerdî. Yanî êzidîyî raştîya xo nîşan dayî. Êzidîyê ke raştîya xo nîşan dayî, ver bi Xobîyîşî ra şonî. Labelê hetê tayînan ra yeno waştiş ke êzidîyî reyna qirkerdişan reyde rî bi rî bimanî.



Nê semedi ra Komara Tirkîya reyde Şengal rê gefan wenî. Komara Tirkîya zî dîyar keno ke eşkeno bikewo Şengal û bi nê vatişan hewl dano ke Şengalî Xobîyayîşî ra dûrî bikero. Wexto ke dîyî ke şengalijî muhîmî nêdanî nê vatişan, na rey zî hewl danî ke bi vêşanî înan terbîye bikerî. Bi raybazo ke sey bîo-îqtîdar yeno şinasekerdiş, hete nînan ra vêşan yenî veradayîş û hewl danî bi no hawa zeyîf bikerî û yewîya înan xira bikerî. Netîceyê nê kerdişan de wazenî ke êzidîyan muhtacê xo bikerî û bi no hawa înan çalakîya înan ra fek verabidî. Çîyo ke merdim mîyanê şaşbîyayîşî de verdano, yê ke nêyî kenî zî xo ra vanî kurd. Hetta nêyî xo sey rayberê kurdan vînenî û wina îdia kenî.

Yê ke sere ra heta nika Kurdistanî binê dagîrkerîya xo de tepiştî, tim vatişanê 'kurdî bi tena sereyê xo nêeşkenî lingan ser de bivinderî, qîmê xo nêkenî û her tim muhtacê dewletêka dagîrker î' goşanê kurdan de sey yew sondî wanenî. Çîyo ecêb o yo ke na rey kurdî polîtîkayê terbîyekerdişî ke hêz û dewletê dagîrkerî vera înan de xebetnenî, ê zî vera kurdanê bînan de kenî. Hem zî kurdê ke tarîx ra nata dej û trajedîyê tewr girdan cuyayî ser de nînan kenî.

Helbuk çîyo ke lazim o bêro kerdiş û nîşandayîş, o yo ke 'êzidîyî wa xo bi xo îdare bikerî, bi hêzê xo yê pawitişî xo bipawî, bibî wayîrê herêmêka xosere, her kes xizmetê Êzidîxanî bikero, hegemonyaya ti partiye esas nêgiro, heme partîyî nêyî esas bigirî, Yewîya Neteweyî, Amerîka û Yewîya Ewropaye zî bibî garantorê nînan, kam ke nê statuyî qebul bikero, herêma xosere ya Şengal do nêyî reyde hereket bêro kerdiş." Cok ra ma vanî Şengal yê şengalijan o. Ya bîn zî eke ma bişînbî Şengalî bi Şengalo xoser û demokratîke tacîdar bikerî, ancax o wext şarê ma yo êzidî heme cayanê dinya de qirkerdiş û qetlîyaman ra xelas beno. No seba êzidîyê ke heme cayanê dinya de cuyenî rê beno moral û hêvî. Yew zî seba nêyî Şengal yê şengalijan o.

# Hîkaye û kirdkî

N.CELALÎ

Hîkayeyî yan zî meseleyî ma de zaf meşhur î. Hem zî hîkayê û meseleyê ma zaf î. Keso ke bêhîkaye û meselan pîl nêbîyo, mîyanê ma kirdan de çin o. Xeyal û vîrî ma bi hîkaye û meselan dekerde yo. Kirdo/a ke qelema ey/a hol a semedê nuştişê hîkayeyan gelek waharî îmkan o. Ma no îmkanî wareyê kirdkî ya nuştekî de vînenî. Kitabî edebî yê ma kirdan zafê yin hîkaye yê.

Nuştox, rojnameger û xebatkarê ziwanê kurdî/kirdkî Seyîdxan Kurij demanê peyînan de yew bereket kewto qelema ey. Ez vana qey zerrê yew serre de hîrê ra zêder kitabî weşanayê. Înan ra di kitabî telîf, yew zî açarnayîşî bi. Helbet ma, Seyîdxan Kurijî rewna şinasnenî. O sey endamê Grûba Xebate ya Vateyî nêzdîyê vîst serran o kirdkî rê xebat keno. Heto bîn ra na xebata xo ya grubî wareyê rojnamegerîye de tetbîq keno. Her ware ser o nuşteyan nuseno.



Kesê ke alaqadarê kirdkî yê, nuşteyanê Seyîdxan Kurijî kovara Vate û Peyama Azadî, Newepel û Şewçila ra şinasnenî. Seyitxan sîyaset ra bigir heta tarîxo fekkî tewir tewir nuşteyî nuştî. Kitabo peyin yê Seyîdxan Kurijî yê hîkayeyan o. Ma hîkayeyanê ey Vate û Şewçila ra nas kenî. Kitab de hikayeyê xo yê vêrîn û ê ke nêweşanîyayê arêdayî. Semedo ke wendoxê kirdkî hetê ey ê edebî bivînî na xebate cayê xo de ya. Helbet Weşanxaneyê Roşna zî xebata erjaye kerda.

Kîtabê Seyitxan Kurijî de heşt hîkayeyî estî. Nameyê înan "Veyvê Çemî Muradî", Astarê Warê Ma", "Agêrayîş", "Trajedîya Zebeşan", "Horîyes", "Şitî Kilkorî", "Grev" û "Derdê Kezebe" yî. Mewzûyê hîkayeyan zafî cûyê dewe ser î. Mekanê mewzûyanê hîkeyeyan zafî dew î, Çewlîg û Xarpêt ê. Qehremanê hikayeyan zî dewij î. Hikayeyan ra yeno famkerdiş ke mewzûyê hikayeyan "raştiqîn" ê. Beno ke nuştoxî, nê hedîseyê raştiqînî bi uslubê xo yê zengîn reyna nuştî. Hikayeyan de teyna cuyê dewe çîn a. Heyato modern ra zî mewzûyî estî. Mavajî, "Grev" ke nameyê xo dayo kîtabî, wendekar û dewijî ke hamnanan ocaxê kerpîçi de xebitîyenê, semedê şertanê xebat û heqê xebatî mucadeleyê înan kerda mewzûyê hîkayeyî.

Kîtabê Seyitxan Kurijî ra yeno famkerdiş ke kirdkî de semedê hikayenuştiş îmkano pîl esto û nuştox zî no îmkan ra zaf hol îstîfade kerdo. Uslubê hikayeyanê klasikî mewzûyanê rojanî de rind şuxulno û cûyê ewroyîn de kabîlîyetê kirdkî nîşan daya. Nê ra ma şikenê vajî ke Seyitxan Kurijî semedê hîkayenuştoxan rayîr bineyna kerdo hera û numûneya erjaya mota.

***No nuşte keyepelê kirdkî.com ra ameyo girewtiş**

Sûrela

## Verra nî herîşan têhet ameyene



Meral Kuçuk

Kam ke qala azadiye keno, kam ke vano ez endî bezar bîno, çik pînî. Eke ewro destê xo binê kemere nêkene, namê kamiyise sima ya ke tewa nêmaneno. Eke pêro dormeyî ke heta ewro qala haştiya şaran kerdene, qalê azadiya ceniyan, kamiyîsan kerdene bêre têhet, qeyta kes virniya quweta demokrasî de besenêkeno vindo. Vengê berz ra faşîzme tersena. Niyaderê çitur dormê xo de çaraxîne. Çixaş vîndî kerdene rê nejdî benê, honde zilmê xo jedenene. Nika no waxt, waxtê en giran o. Coka faşîzma name benê, şîndor nas nêkene herîşanê xo de. Kurdî, cenî, elewî, sosyalîstî, kam kî lewê înan de niyo hedef de rê.

Ceniya ke ewro Rojhelato Miyanên de en jede biya hedef, verra tariyê sîstema kapîtalîst kî na herême ra verra herîşan vengê xo a kena berz. Hama no veng gunê hên vila bibo ke her ca ra bero hesnayene. Teyna jû roze nê, her roz kistene, herîşî estî. O waxt xoverdayene, tekoşîne ke gunê her roz biramo. Nika pêro gosê heşîne pê, pêro çimê vînene, homete sero senê wazene qileriya xo vila bikerê. Ewro şiddete her ca de her kesî ser o, her cayê weşiye de yena ramitene. Avê ceniyan, dime ra îtîqatan, kulturan û şaran wazene biqedne. Faşîzme hona ke her cî nêgureto binê bandora xo, waxt serva xoser ameyene esto. Vîneme serva hukumdariya xo senê şîddet danê ramitene. No bi raya ekonomî, sosyal a ke yeno ramitene. Zoneme sîsteme en jede tariyê xo ceniyan ser ra ramena. Ceniya ke erzena xo ver ayê kenê çimê xo. Zonene eke cenî teslîm ame guretene, homete ke teslîm cerîna. Polîtîka asîmîlasyon, serestisan, qedinayene yê saraya ewroyîne û hukmatê AKP teyna verra ceniyan, kurdan nê, elewiyan kî esta. No sîstem wazeno pêro îtîqatan, pêro kamayisan bicero binê bandora xo. Wayirê zîhniyetê xo yê jû bikerê. Demo ke nayê ramene jû hetê homete jedena kenê hedef. Na kî na rûal ra niyara; kot ke verra na herîsan verra na zîhniyetê jû xoverdayis esto uca de zilm, herisî, qetlîame ke honde benê jede.

Kurdî ke serva piya weşiye kerdena şaran tekoşîne danê, wazene ke eke qalê demokrasî bî, her kes zerrê ci de ca bicero. Serva na demokrasî endî zonê dismeniye, zonê herîşkar bero caverdayene. Na kî çitûr bena, zîhniyetê jû werte ra bero wedardayene. Teyna ma estê me, teyna ma kî savake qese o wo vatena raye nêna guretene. Kistene, riznayene, herîşî teyna carabiyayena.

Tirkiya ke her roz jedena devacer sona, krîzede pîl ciwiyena. Nika ma kî Rojhelato Miyanên de niyada, werte şaran de lejê welatan, dewletan ano kotî zelal vîneme. Coka serva şaran hetê çarekerdene ser gurenayise jede bibê, kamî bierzê xo ver jedena rind o. Nika par ra na het sûkê kurdan yenê riznayene, domanê ci yenê kistene, cenazê mayan bi rozan de kuçeyan de mend, hona ke herîşî ramene. Krîza ke nika Tirkiya ciwiyena, eke na siyaset niya dewam bikero jedena bena girs. Serva pêro şaran, pêro dormeyan kaos ra qeyîr tewa niyano. Na kaos ra vejiyayene kî teyna verra siyasetê lejî vinitena bena. Tariye înan xo ser de nayê pûkeleke ano, teyna çeber guretene zereyê de xo wedardayena nêverena na pûkeleke her ca riznena hîn verena, coka o wo ke muhîm o têhet ameyene û verra faşîzme desê qayîm munetena. Verra bingê guretena faşîzme, bingê guretena zîhniyetê înkarî tekoşîne muhîma. En jede kî cenî û elewî nayê xo ra pers bikerê, nayê ra tepiya eke ma bêveng viniteme sebeno? Eke pêro piya bivime jû a waxt senê weşiye cemê destê xo?

www.arsivakurdi.org

# Mi fam kerd ke Sara abîdeya MERDIMÎ YA

Alîşêr Pîro ke qetilbîyayîşê 3 cinîyê yê Parîsî ra dima beşdarê gerîla bîbî, wina va: "Sara (Sakîne Cansize) kam bîye, Leyla Şaylemeze û Fîdan Dogane kam bîye? Mi o wext cigêrayîş kerd û mi fam kerd ke; Sara abîdeya merdimîye ya"

ROJBÎN DENÎZ / BEHDÎNAN - ANF




Qetilkerdişê Parîsî ke 9ê Çeleyê 2013 de bî û 3 cinîyê şorişgerî Sakîne Cansize (Sara), Fîdan Dogane û Leyla Şaylemeze ameybî qetilkerdiş û sey dewamê komploya mîyanneteweyî ya 15ê Sibata 1999î yeno vînayîş, 4 serran pey xo de verda.

Babete ser o gerîlayê HPGyî Alîşer Pîro ke qetilkerdişê Parîsî ra dima beşdarê gerîla bîyo, qisey kerd.

Gerîla Pîrî va 'Heta ke mi qetilkerdişê Sakîne Cansize eşnawite, mi aye nêşinasnayêne' û qiseykerdişê xo wina domna: "Wexto ke mi eşnawit, cuye seba mi vindete; çimkî sucê merdimî ameybî kerdiş. Sakîne Cansize, Leyla Şaylemeze û Fîdan Dogane kam bîy? O wext mi dest bi cigêrayîşî kerd û mi fam kerd ke embaza Sara abîdeya merdimî, wijdan, heskerdiş û hîsêko ke seba merdimî têkoşîn dana ya."

**WENDEKARÊ SAKÎNE**

Pîrî dewamê qiseykerdişê xo de va 'mi netîceyê cigêrayîşê xo de dî ke dewletêka bi hezaran serran o ke bi zulm, wehşet û qirkerdiş virazena, esta û vera dewlete de kesêka bi hawayo nêters vindena' û wina dewam kerd: "Mi kîtabê aye de dî ke Sara hepisxaneyî de vera îşkence û hêrişê wehşetan de xover daya. Cinîya ke mi nas kerd, qehremanêk bîye.



O wext merdim fam keno ke wijdan çî yo û bi wijdan cuyayîş çîyêko senîn o. Kitabê xo de vatbî 'madem ez dişmenî reyde ameya têrî, o wext ganî ez bi hawayo gird xover bida, teslîmbîyayîş îxanet o' û ez nê vatişî ra zaf tesîr bîya û mi waşt ez biba wendekarê aye. Çimkî zaf çîyê ke ez aye ra bimusa estbî. Wexto ke mi embaze Sara şinasna, mi nezanîya xo fam kerde. Embaze Sara seba bîyayîşê mi yê mîlîtanê PKKyî cesaretêko gird da mi."

**ÎXANETÊ CUYAYÎŞÎ YO**

Pîrî va 'famkerdişê Sara û sey aye cuyayîş merdimî kêfweş keno' û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Hetê bindestan de ca girewtiş, pawitişê merdimî yo û çîyêko zaf weş o. Pawitişê zalimî îxanetê merdimî yo. Vera zaliman de vindetiş, vera înan de sere nêronayîş karê wijdanî yo. Cok ra merdim ruhê aye bido cuyayîş û cuyayîşî rê wayîr bivejîyo, o wext merdim eşkeno xoverdayîşêko gird nîşan bido. Ancax o wext merdim eşkeno tim qezenc bikero. Bîyayîşê mîlîtanêko gird ancax karê merdimanê wijdaninan mumkun o. Ganî ma tim muhakemeya wijdanê xo bikerî û mîyanê cuye de wina hereket bikerî."



## 'Merdim vera Sara de ancax eşkeno xo rexne bikero'

**GERÎLAYÊ HPGYÎ** Nûman Amedo ke şorişgera cinî Sakîne Cansize şinasneno, serrgêra şehadetê aye de qala Sakîne Cansize kerd.

Amedî va 'serrgêra embaza Sakîne de qiseykerdiş xeylê zehmetin o' û wina domna: "Xeylê rojî estî ke merdim qet nêwazeno ke bîyaro vîrê xo. Nê rojan ra yewe roja 15ê sibate ya, ya bîn zî roja şehadetê embaza Sara ya. Nê her di rojî hem hetê ruhî û hem zî hetê şertê tebîetî yewbînan manenî. Her diyan de zî zimistan zaf xedar derbaz bî û her dîyan zî tesîrêko gird ser ma de viraşt."

**TEMSÎLKARÎYA CINÎ KERDÊNE**

Amedî dewamê qiseykerdişê xo de dîyar kerde ke 'embaza Sakîne şexsîyete cinîyêk de serkewtişî xelq kerde' û wina va: "Mi serra 96 de warê Rayberî de embaza Sara şinasna. Tayê şexsîyetî estî, her tim herikîyenî. Tarîxê cinîyê dinya de şexsîyetê sey Rosa Luksemburge, Klara Zetkîne û sewbîna estî. Embaza Sara mîyanê PKKyî de temsîlkarîya şexsîyetê cinî kerdêne. Goreyê mi cinîyê sey Sara kêmî yî. Vera şexsîyetêko winasî de ancax merdim eşkeno xo rexne bikero."

**EMBAZA SARA SEY KÎTABÎ YA**

Amedî peynîya qiseykerdişê xo de va 'nê xusûsîyetê embaza Sara zaf mi ser de tesîr kerdî' û wina qedêna: "Çîyê ke seba tebîetê cinî, edalet û wijdanê cinî ameybî vatiş, heme şexsîyetê embaza Sara de roniştbî. Cok ra xeylê embazê ciwanî problemê xo aye reyde pare kerdêne û hetkarî waştêne. Aye zî zaf hetkarî dayêne embazan. Mi zî bi desan reyan zehmetîyê xo bi embaza Sara reyde pare kerdo. Nika zî wendekarêko şêro dibistan û kîtab desê ey de bibo, embaza Sara zî sey kîtabêk destê mi ver de ya." **BEHDÎNAN - ANF**

## Cuya mi bi Şorişê Rojawanî bedilîya

Nê rojê ke çim û goşê dinya operasyonê Reqqa ser de yo, gerîlaya bi nameyê Sarya zî mîyanê operasyonî de cayê xo gêna. Sarya cuyayîşê xo yo ke gerîlatî ra ver de xeylê zehmetîyan anta. Ya zî sey cinîyanê bînan mîyanê zîhnîyeto feodal û keyeyî de xeylê tedayan reyde rî bi rî menda.

Gerîlaya cinî Saryaya ke reqqayij a, qala cuyayîşê xo kerde.

Saryaye va 'mîyanê keyeyê mi de vera cinîyan de tedayê girdî estbî' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Na rewşe tena keyeyê mi reyde eleqeder nêbî, heme Sûrîye de wina bî. Cinî planê dîyine de ameyêne dîyayîş. Her çiqas ke cuyayîşê mi de muhakemekerdişî estbî zî muhakemeyî bi netîce nêbîyêne. La wextê averşîyayîşê Şorişê Rojawanî de mîyanê



komelî de bedilîyayîşî bîyêne û mi zî xo rê yew plan viraşt. Kesê ke bişinbî cuyayîşê mi bibedilnî, vejîyayî vernîya mi. Mi verê waşt mîyanê Şorişê Rojawanî de ca bigira, la dima mi qerar da ke ez beşdarê gerîla biba. Çimkî çiqas ez sîstemî ra dûrî bikewtêne, hende baş bî. Cok ra ez ameya koyan."

**TEHMÊ CUYE**

Saryaye dewamê qiseykerdişê xo de va 'ameyîşê koyan ra dima ez resaya cewherê xo' û wina qedêna: "Şorişê Rojawanî Reqqa de tesîrêko gird viraşt. No tesîr bitaybetî cinîyan de ameyêne hîskerdiş. Ez sey yew cinîye resaya tehmê cuyayîşî. Operasyono ke ewro seba girewtişê Reqqa yeno viraştiş, muhîm o. Çimkî eke Reqqa de felsefeya Rayberî hakim bibo, o wext şarî eşkenî bi hawayo azade têhet de bicuyî. Goreyê mi azadkerdişê bajarê Reqqa seba demokratikbîyayîşê Sûrîye xeylê muhîm o."

***BEHDÎNAN - ANF***

## Baas ra tewrê şerê HSDyî bî

Her roja ke şono her bawerî û her cîyayeyê tewrbîyayîşê HSDyî zêde beno. Hîkayeya Ciwan Reqqayî zî leşkerîyê Baasî ra reseno Hêzê Demokratîke yê Sûrîye (HSD) yî. Şerwanê ke hemleya Xezebê Firatî de ca gênî azadîya Reqqa û Sûrîye ya Demokratîke hedef gênî.

Babet ser o şervanê HSDyî Ciwan Reqqayî qisey kerd û qala hedefê tewrbîyayîşê xo kerd.

**DO ŞARAN RÊ ÇARESERÎ BÎYARO**

Ciwan Reqqayî qiseykerdişê xo de va 'şarê Sûrîye destê çeteyanê DAIŞ, OSO û El Nusrayî ra zaf dejî antî' û wina domna: "HSD do şaran rê çareserî bîyaro.



Keyeyê min o ke Reqqa de bî hêrişanê DAIŞ û Baasî ver remayî. HSD seba ke hêvîya azadî dano şaran, ez tewrê şer bîya. Ma seba ke Reqqa destê çeteyanê DAIŞî ra azad bibo, şer kenî. Ma zaf dewan destê çeteyan ra girewt. Ma game bi game nizdîyê Reqqa û azadîya erdê xo benî. Çete nêeşkenî vera ma de bivindî û şer bikerî. Ez seba azadîya şarê xo û erdê xo têkoşîn dana."

**'SEBA SÛRÎYÊKA DEMOKRATÎKE'**

Ciwan Reqqayî qiseykerdişê xo wina qedêna: "Çeteyê DAIŞî wexto ke nêeşkenî vera ma de şer bikerî, bombe bestenî xo û wazenî xo biteqnî. Zaf reyan zî remenî. Heta ke heme erdê ma destê nê çeteyan ra pak nêbo, ma do bi qerardarî şer bikerî. Ma ti şaran zî bêwayîr nêverdanî. Ma do pîya bicuyî û pîya zî şer bikerî." **REQQA - DÎHABER**

## Keye cemedîyayîş reyde rî bi rî yo

Netîceyê şero mîyanên yê Sûrîye, bi sehezaran kesî amebî bajaranê Tirkîya û Kurdistan de bica bîyî. Nê keyeyan ra yewe zî bajarê Wan de bica bîyo. Keyeyo ke Heleb ra amebî û qezaya Tuşpa ya Wanî de bica bîyo, Meryem Yasîne, mêrdeyê aye û 4 domanan ra pê yeno. No keye mîyanê bereqeyêka naylone de cuyeno û seba ke nêcemidî betanîyan xo ra pîşenî. Keye bereqeya xo kerdî 2 beşî û beşêk de firaqê înan û beşa bîne de zî ê bi xo manenî. Rûkena ke yew û nîm serre ya bi rîyê xo yê huyaye, mîyanê şertanê giranan de zî kay kena. **WAN**

## Her 3 kesan ra kesêk grîb bîyo

Bi serdbîyayîşê hewayî, nêweşîya grîbî de zêdebîyayîş virazîya. Goreyê analîzo ke Wezaretîya Weşî 17 bajaran de 180 keyeyan ser de kerdo, nînan ra sera 34.6ê ci de grîb ame tespîtkerdiş. Xora beşa lezgîne ya heme nêweşxaneyan de muracatê nêweşan xeylê zêde bîyo. Endamê Heyetê Îlimê Grîbî Prof. Dr. Mehmet Ceyhanî babete ser o wina va: "Seba ke esmer serdî rew dest pêkerdî, nêweşîya grîbî de zî zêdebîyayîşêk bî. Ma do heta wisarî nêweşanê grîban bivînî. Seba tedbîrî ganî derzîna grîbî pirodîyo û mîyanê rojêk de 4-5 rey destî bi sabûn bêrî şiwitiş. **STENBOL**

www.arsivakurdi.org

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. *No:* 23/A
*Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:*
rojevamedya@hotmail.com

# Ji payizê ve ji zivistanê re amade ne

Niştecihên gundê Gokçekanatê behsa jiyana xwe ya gund kir û diyar kir ku wan ji payîzê ve hemû amadekariyên xwe kirine û ji ber vê yekê zivistanê zehmetiyan nakêşin. Gundê ku atmosfereke hevgirtinê lê heye, girêdayî çand û toreya bav û kalan e


## 'Ji jiyana gund hez dikim'

**WELATIYA** bi navê Rabîa Çakabay (54) jî tevî hevjînê xwe li gund dijî. Çakabay bi 2 çêlekan debara xwe dike û diyar kir ku li gund jin bêtir dixebitin. Çakabay got ku ew zivistanan pir naxebitin lê belê havînan jin pêşengiya her karî dikin. Çakabay got ku li gund rojên sohbetê yên jinan hene û anî ziman ku li gund ew zivistanên xwe bi van sohbetan derbas dikin. Çakabay anî ziman ku ew li gund xwarinên herêmî û xwezayî çêdikin û wiha axivî: "Ji jiyan û hewaya gund hez dikim. Naxwazim li bajaran bijîm. Li bajaran kes naçe malên hev. Lê em li vir di nav hev de dijîn û dixwazin her li gel hev bin."

Niştecihên gundên Çewligê yên di zivistanan de heta demeke dirêj têkiliya wan bi derve re qut dibe, li gorî van şert û mercan jî her li gel wan çandeke zindî heye. Gundê Gokçekanatê yê girêdayî navendê, nêzî 100 malbat lê hene. Niştecihên vî gundî, heta niha li gel hemû çewisandin û pêkutiyên dewletê jî, terka gundê xwe nekiriye û xwedî li çanda xwe derdikevin. Niştecihên gund ên nemaze ji dema Serhildana Şêx Seîd heta salên 2000'î rastî her cure pêkutiyên dewletê hatin, li gel ku malên wan hatin şewitandin jî gundê xwe vala nekir. Malbat debara xwe bi sewalvaniyê û mêşvaniyê dikin. Niştecihên gund her sal beriya zivistanê dexl û zadên xwe stok dikin, êmê heywanên xwe, ji bo şewitandinê êzingên payîzê berhev dikin û li ber deriyên xwe dikin hezaz. Liv û tevgera li gund, her sibeh şefeqê dest pê dike û heta derengiya şevê didome. Gundiyên ku bi êmdayîna heywanên xwe dest bi rojê dikin, li gel zêdebûna berfê jî bê astengî û zehmetî karên xwe dikin.

### ÇANDA XWE DIPARÊZIN

Bavê 10 zarokan Şukru Çakas (72) ê behsa jiyana gund kir got ku ew li gund çêbûye û mezin bûye û debara xwe bi






sewalvaniyê dike. Çakas diyar kir ku 8 çêlekên wî hene û got ku berên şîr ên ew ji heywanan werdigirin ji zarokên xwe yên li bajarên cuda dijîn, dişîne. Çakas got ku wî hemû zarokên xwe dane xwendin û anî ziman ku niha her kes xwedî karekî ye. Çakas got ku ew û hevjîna xwe tenê li gund dimînin û destnîşan kir ku beriya berf bibare ew amadekariyên xwe dikin.

### ROJEV ŞER E

Çakas anî ziman ku zivistanan pir karê wan tune ye û ji ber vê ew pir rastî zehmetiyan nayên û wiha domand: "Dema dibe êvar jî em gundî li malekê dicivin. Em ji zarokên xwe re qal û bala berê dikin. Lê ev salek e, bi piranî em behsa rojeva siyasî ya Tirkiyeyê dikin. Em dibêjin, dê ev şer çi bibe. Heta ji dest me tê em çanda xwe bi awayekî komunî didin der. Kal û bavên me çawa jiyane, em jî li gorî çand û mîrateya wan dijîn. Ji ber ku em li gund dijîn, me çanda xwe parast. Ji ber vê divê em gundê xwe vala nekin. Heta salên 2000'î dewletê pir bi ser gundê me de girt. Lê di encama berxwedana gel de, niha tu tengasî û zehmetî tune ne. Pirsgirêk, tengasî û êşên li welat bandorê li me dikin. Tenê daxwaza min em salên aştiyane derbas bikin."

### JI BAJARAN HEZ NAKE

Ziraç Çakabay (60) piştî 6 zarokên wê dizewicin, ew bi tena serê xwe li gund dimîne. 33 sal berê hevjînê Çakabay, li herêma bejahiya gund bêyî hincet û sedem ji aliyê dewletê ve tê qetilkirin. Çakabay got ku hê jî ew nizane hevjînê wê ji ber çi hatiye qetilkirin û anî ziman ku wê di şert û mercên zehmet de zarokên xwe li gund mezin kirine. Çakabay got ku li gel ew qas êş û azaran jî wê gundê xwe neterikandiye û nexwestiye biçe bajaran û anî ziman ku dema ew diçe bajaran nexweş dikeve. Çakabay anî ziman ku ew di temenekî biçûk de hem bûye bûka gund hem jî keça gund û got, li gel zehmetiyên xwe jî jiyana gund xweş e. **ÇEWLIG - DÎHABER**



# Ji ber tunebûna avê, berfê dihelînin

Li gundê Olçuluyê yê 16 kîlometre dûrî navenda Qersê, her sal bi hatina zivsitanê re pirsgirêk û çîleya avê xwe dide der. Li gundê ku germahiya hewayî 32 pîle di bin sifirê de ye welatî 7 mehên salê bi ker û hespan berê xwe didin deverên bilind ên gund û li wan deran berfê berhev dikin û paşê ji bo ku bikin av dihelînin.

### BERFÊ DIHELÎNIN

Ji ber ku li gund zivistan dijwar derbas dibin, di van şert û mercan de yê herî zêde eziyetê dikêşin dîsa jî jin in. Ji ber serma û cemedê, ava şebekeyê qeşa digire. Jin jî berfa li hawirdorê û deverên bilind ên gundan berhev dikin û bi vî awayî pêdiviya xwe ya avê bi cih tînin. Jin ava di depoyan de ji bo karê paqijiyê bi kar tînin û her wiha ava ji berfê bi dest dixin jî ji bo xwarinê û hwd. bi kar tînin.

### HESRETA AVÊ

Ji niştecihên gund Kadriye Demîr a 80 salî anî ziman ku ew bi hesreta avê ne û wiha domand: "Salê 7 meh bê av derbas dibin. Berê ciwan bûm, ev qas ji bo min ne pirsgirêk bû. Lê êdî pîr im. Nebûna avê ji bo min wekî îşkenceyê ye. Heke ne ji cîranê min be, ez ê ji bêaviyê bimirim."

Demîr got ku di 65 salên xwe de her zivistan ji bo avê li girên gund berf kom kiriye û wiha axivî:



"Li vî gundî, min çavên xwe vekirine av tune bûye. Ez ê çavên xwe bigirim lê hê jî av tune ye. Dema siheta min baş bû, ez jî bi hespan diçûm ser girên gund û min berfa paqij berhev dikir. Lê êdî pîr im, nikarim biçim berfê bînim."

***QERS - DÎHABER***

## Dema mirov KARKER BE...



**Di demsala zivistanê de yek ji mehên herî bi sir û seqem derbas dibe meha çile ye. Li Amedê li gel hewaya sar û seqem jî karker ji neçarî dixebitin û debara malbatên xwe dikin. Karkerên li Hala Fêkî û Sebzeyan dixebitin bi kedeke mezin karê xwe dikin û destê wan ji serê sibê heta êvarê di nav avê de ye û pincaran dişon. Karker di nav rojê de di nav ava leganê de pincarê dişon û carinan jî li ber sobeya êzingan destên xwe yên cemidî germ dikin.**

**AMED - DÎHABER**

# Sobe li dijî teknolojiyê li ber xwe didin

DENÎZ UMUT / BAZ MORDEM – WAN / ANF

Karê çêkirina sobeyên êzingan ku pîşeya pêşiyan e, ji ber pêşketina teknolojiyê di rewşeke xeternak de ye. Li Bazara Sobeyan a li navçeya Rêya Armûşê ya Wanê, hostayên vm pîşeyê bi biryardarî xwedî li karê xwe derdikevin. Li vê bazarê sobeyên êzingan, agirdank, semawer, çaydank, bêr û qamîş tên çêkirin.

Hostayê sobeyan ê bi navê Yusuf Erors got ku ew nêzî 30 sal in li vê bazarê dixebite û wiha qala hunera xwe kir: "Di emrê zarokatiya xwe de min dest bi vî karî kir. Ez hê zarok bûm, hostayê min çû ser dilovaniya xwe û min xwest mîrateya wî bidomînim. Nêzî 30 sal in ez vî karî dikim. Di roja me ya îro de karê me li hemberî pêşketina teknolojiyê li ber xwe dide. Em li vir sobeyên daran, agirdank, semawer, çaydank, bêr û qamîşên komirê çêdikin. Di werza (demsal) zivistanê de sobeyên daran tênê firotin û havînê jî semawer û agirdank tênê firotin. Wekî salên berê êdî tu kes naxwaze bi vî karî ve mijûl bibe. Em jî dixwazin vê hunera bav û kalan bidomînin."



Erors anî ziman ku beriya niha karê li bazara wan gelekî baş bû û anî ziman ku ji ber krîza aborî ya li herêmê êdî li bazarê kirîn nayê kirin û wiha got: "Ev salek e li bazarê kirîn zêde nîn e. Beriya niha me rojê nêzî 14 sobe difirotin, lê belê niha ji ber pêşketina teknolojiyê û krîza aborî tu kes nakire. Niha tenê welatiyên li gundan dijîn tên bazarê û sobeyan dikirin."

www.arsivakurdi.org